
# GEORGE ORWELL



**GEORGE ORWELL**
**ANIMAL FARM**
**Kurdî – Kurmanji**

# ZEVIYA AJELAN

**Ji İnglizi Werger**
**Rewşen Hisên**

2022

© Copyright 2022

## **George Orwell**

George Orwell ku navê wî yê resen Eric Arthur Blair e, di sala 1903 de li Hindîstana bin deshilatdarîya Britaniya li bajarê *Mothari- Bengal*ê hatiye dinyayê. Bavê wî di karûbarê medenî yê Hindistanê de karbidestekî piçûk ê Brîtanî bû; diya wî, ku ji fransî ye, keça bazirganekî li *Myanmar* (*Burma*) ê bû. Piştî ku bi dêûbavên xwe re vedigere Îngilîstanê, di sala 1911-an de ew hate şandin dibistanek konseya amadekariyê ya li *Sussex*. Li vê dibistanê hate naskirin weke xizan lê gelek zîrek û rewşenbîr.

Orwell bûrs ji du dibistanên sereke yên Îngilîstanê wergirt û ji 1917 heta 1921 xwendina xwe berdewam kir. Aldous Huxley yek ji mamosteyên wî bû, û ew li *Eton* bû ku ew yekem nivîsa xwe di kovarên zanîngehê de weşand. Li şûna xwendina zanîngehê, Orwell biryar da ku kevneşopiya malbatê bişopîne û, di 1922 de, çû *Bûrma*yê wekî alîkarê serfermandarê navçê di Polîs ê Imperial Hindistan ê de. Wî li gelek qereqolên welêt xizmet kir û di destpêkê de wekî xizmetkarek împaratorî xuya bû. Lê dîsa jî ji zarokatiya xwe de dixwest bibe nivîskar, û gava ku wî fêm kir ku *Bûrma* çiqas li dijî îradeya wan ji hêla Ingilîzan ve tê ne rêvebirin, wî ji rola xwe ya wekî polîsek kolonyal şerm kir.

Dûv re ew bû ku serpêhatiyên xwe û reaksiyonên xwe yên li hember desthilatdariya emperyal di romana xwe ya *Burmese Days* de vegot.

Di sala 1927an de Orwell di betlaneya Îngilîstanê de biryar da ku

venegere *Bûrma*yê û di 1928an de dev ji karê xwe berda. Orwel ji bo jiyana gelên belengaz û derbider têbigehêje bi cil û bergên gemarî, çû taxên rojhilatê *London*ê da ku li malên razanê yên erzan di nav karker û parsekan de bijî. Demekê jîyana xwe li taxên *Parîs*ê derbas kir û li otêl û xwaringehan wek firaqşûştinê xebitî. Van serpêhatiyên xwe nivîsî di pirtûka xwe ya bi navê '*Down and Out in Paris and London*' de.

Nerazîbûna Orwell li dijî emperyalîzmê ne tenê bû sedema redkirina wî ya kesane ya şêwaza jiyana bûrjûwazî, lê ji nû ve rêgezek siyasî jî kir. Yekser piştî ku ji *Bûrma*yê vegeriya wî xwe anarşîst bi nav kir û çend salan wiha domand; Lê belê di salên 1930-an de, wî dest pê kir ku xwe sosyalîst bihesibîne.

Dema ku Şerê Cîhanê yê Duyemîn hat, Orwell karûbarê leşkerî qebûl nekir, li şûna leşkeriyê heta sala 1943-an serokatiya BBC kir.

Orwell di sala 1944an de, pirtûka xwe ya bi navê ***Animal Farm*** (*Zevîya Ajelan*), qedand. Di pirtûkê de komek ajalên zozanan, xwediyê zevîya xwe yên mirovên mêtinkar ji holê radikin û ji xwe re civakek wekhevparêz ava dikin. Di dawiyê de rêberên jîr û hêzdar ên heywanan, beraz, şoreşê dipelixînin û dîktatoriyek ava dikin ku koletiya wê ji ya mirovên xwediyê wan ên berê jî zordartir e.

Di destpêkê de Orwell di peydakirina weşangerek ji bo çapkirina pirtûka xwe gelek dijwarî dît. Lê gava ku ew di sala 1945-an de çap kir, ev yek ne tenê ew navdar kir, her wiha yekem car ew dewlemend jî kir.

Zevîya Ajelan yek ji baştirîn berhemên Orwell bû, tijî jîr û xeyal û bi heyranî hatibû nivîsandin. Lêbelê dema cara yekem çap bû zêde bal nekêşa ser xwe, di bin siya pirtûka wî ya paşîn, *Hezar Nehsed Heştê û Çar* (1949) de ma.

Orwell rûpelên paşîn ên *Hezar Nehsed Heştê û Çar* li xaniyê xwe yê li girava *Hebridean* de nivîsî, ev xanî wî bi dahatên pirtûka *Animal Farm* kirrîbû.

Di Çileya 1950-an de dema ku ji ber nexweşiya tîrêjê (tuberkuloz) dihate dermankirin, li nexweşxaneyek *London*ê mir.

## BEŞA 1

Johns, xwediyê zeviya Manor, di dawiya şevê de deriyê kozika mirîşkan girt, lê ji ber ku pir serxweş bû nehate bîra wî deriyê biçûk yê ajelan bigire. Bi roniya çiraya xwe ra ser rê û bin rê diket ta gihişt dawiya hewşê. Potîna xwe li deriyê dawi xist û ji xwe re piyaleke bîra ya dawiyê ji bermîla çêjtxanê[1] anî û ber bi nivînê xwe ve ya kû jina wî li ser de di xeweke kûr de bû, çû.

[1] lezetxane, xwaringh

Dema ku roniya odeya wan vemirî deng û tevger li cihê din ji zeviyê hat. Ji ber ku gotinek di nav ajelan da belav bûbû ku Major, ew berazê spî û ne gelek buha û dihate naskirin bi navê Majorê Pîr di şeva borî de xewnek dîtibû û dixwest ji ajelan re bêje. Gişan biryar dabûn ku bicivin di axura mezin de piştî ku Johns here razê.

Majorê Pîr bi vî navî dihate naskirin lê dihat pêşandan li bazarê bi navê Willingdon ê xweşik. Cihê rêzê bû di zeviyê de ku ajel hemî amade bûn ku xewa xwe bihêlin ji bo ku li Major guhdar bikin.

Di dawiya axurê mezin de Major li cihê xwe yê ji pûş rûniştîbû û çira di ser re bû. Major 12 salî bû û hinekî qelew bûbû lê berazekî gelekî xweşik bû.

Piştî demeke kurt hemî ajel gihane hev û cihê xwe xweş kirin, lê bêguman hemî ne weke hev bûn. Pêşiyê her sê seg hatin; Bluebel, Jessie, Pincher. Piştî wan beraz

hatin û beramberî Major rûniştin. Mirîşk li ser pencereyê lîs bûn û cihê xwe girtin. Kevokan cihê xwe li ser darê ban çêkirin. Pez û çêlek piştî berazan xwe berdan xwarê, êdî herdu hespên mezin Clower û Boxer bi giranî hatin bi sistayî rûniştin ji bo ku pêl wan ajelên biçûk nekin.

Clower mehîneke bi ceger bû, her wiha dilnerm bû, bi temenê xwe ne mezin bû. Boxer hespekî gelek girs bû, nêzî du mitroyan bilind bû û hêza wî weke hêza du hespan bû, lê xuyadikir ku hinekî gêj bû. Bi rastî ew ne gelekî zîrek bû lê bi karê xwe gelekî pêkhatî bû. Hemî ajelan rêza wî digirt.

Piştî herdu hespan bizina spî ya bi navê Muriel, kerê bi navê Benjamin hatin. Benjamin bi temenê xwe mezintirîn ajel bû li zeviyê. Axafrtinê wî gelek kêm bû û cara axifîya hemî bi axaftina wî dikeniyan, lê ti carî ew bi xwe nedikeniya û eger ji wî pirsîbana ‘tu çima nakenî’, digot: ‘tiştek nîne kenê min pê

were'. Lê tiştê ku teva zanîbû ku Benjamin gelekî ji Boxer hezdikir û pê xweş bû û bêhtirîn caran li gel hev bûn û her yekşemê diçûne wê mêrga piştî gulîstanê di mexel de, pala xwe didane hev û bêdeng diman.

Dema herdu hesp gihan cihê xwe çend çîçikên ordekan bi ser diya xwe ve wenda bûbûn û diçû û dihatin li cihekî digeriyan ku xwe biparêzin ji pêlêkirinê. Êdî Clower ew da ne hev bi lingê xwe û ew himbêzî xwe kirin, yekser ew ordek bi xew de çûn.

Nêzîkî dawiyê Mollie, mehîna pir gêj, ji wê ve hat û lepek şekir di devê wê de bû. Çû li pêşiyê mexelt û bi mûyê suqura[2] xwe list. Divîya ku çavê hemîyan bikêşîne li ser wê rîbanda[3] pê ve.

Û dawiyê pisîk hat weke her carê li dora xwe geriya li germtirîn cih, û çû xwe

---

[2] poperîşk, yele *(en. mane)*

[3] qûrdele *(en. ribbon)*

xist nawbera Boxer û Clower û di xew ve çû, bê î ku gotinekê ji Major bibihîze.

Ajel hemî li hev civiyan ji bilî qijikê bi navê Moses. Dema Major dît hemî ajel gihane hev ku cihê xwe xweş kirin, dengê xwe zelal kir dest bi axaftinê kir:

-“Hevalno! we bihîstiyê ku min şeva çûyî xewneke sosret dîtîyê, ez ê piştre xewna xwe ji we re bêjim. Lê niha tiştekî din heye bibêjim weke niha ez bi we rûniştîme di baweriya min de ez ê piştî çend heyvê din nebim. Ev mirin zagoneke sirûştî ye û ez ê li ser mijara zagonê sirûştî biaxifim. Hevalno, armanca vê jiyana me çi ye? … Ka em rastî biaxifin jiyana me xembar e dijwar e û kurt e. Ji dema em çêbûne êmekî didine me, tenê ji bo ku em bijîn û nemirin. Hevalên me yên ku xwedî hêz in kar bi wan dikin ta hêz di wan de nemîne, û dema hêza me nemîne em tê serjêkirin bi awayekî botik û dilreq. Ne ajelek jî ji Englandê wateya jiyana xwe nizane piştî dibe yek salî.

Ajelek li Englandê azad nîn ê, jiyana wan xemgîn û bindestî ye, ev rastiya ber çav e. Lê gelo ev bindestî zagoneke siruştî yê, gelo bi dîtina we ev xaka em li ser dijîn wiha belengaz u bêber e, nekane jiyanake bi rûmet bide me? Na hevalno û hezar carî na! Axa Englandê dewlemend e û maldar e, û geşûhewa wê xweş e û dikare êm bide jimarek gellekî ji me bêtir. Zeviyek tenê weke vê dikare 12 hespan 20 çêlekan û bi sedan pez xwedî bike. Bi xweşiyeke wiha ku di xewnan de jî neyê dîtin… Gelo çima em qîma xwe tînin bi vê jiyana hejarî û xembarî? Berhemê karê me hemî digihe mirovan, li vir hevalno bersiva hemî derd û daxwazên me ye. Sedema vê rewşa nexweş hemî di gotineke tenê de ye; mirov!.. Mirov bi tenê dijminê me ye. Mirov bi tenê dijminê me yê rastî ye. Mirov ji jiyanê rakin ku sedema birçîbûna me û giraniya karê me bi dawî dibe. Di nav hemî afirendiyên cihanê de mirov ew e yê ku distîne û

nade. Dixwe û kar nake. Ne şîr dide, ne hêkan dike û afirendîyekî lawaz e; nikare cot bike, pey kivroşkan bikeve û bar hilgire, û wilo jî ew serdariya ajelan dike, kar bi wan dike û beramberî wê êmekî kêm dide wan tenê ji bo nemirin û kar ji wî re bikin, û para herî mezin ji xwe re dibe. Em bi karên xwe xakê cot dikin, bi rêxa xwe axê xurt dikin û werê jî tiştekî me tenê ji bilî çermê me nîn e... Çêlekno! hûn karin bêjin min çend galon şîr da di vê sala borî de û bi ku ve çû ev şîr? Yê ku pêwist bû ji bo golikên we... Her dilopek jê kete devê dijminê me... Hûn mirîşkno! Çend hêk we kirin di vê sala çûyî de? çend hêk ji wan bû çîçik? Yên din giş hatin firotin li bazarê bûnin pere û ketin bêrîka Johns û peyayê wî. Tu Clower, çi bi wan her çar ciwanîkên te hat? Wê kî pişta te di pîrbûna te bigire? Her yek ji wan di sala xwe ya yekem de hate firotin. Û tu nema wan dibîne. Û beramberî wî karê te yê giran û dana te çi ji te re hat?

Ji bilî êmekî kêm û cihekî teng ji bo razana te. Ser vê yekê de jî ev jiyana me ya xemgîn û tahl nagihe dawiya xwe ya sirûştî... Ez bi xwe gazindan ji rewaşa xwe nakim, ji ber ku ez bûme 12 salî û bêhtir ji 400 zarokê min çêbûn. Ev jiyaneke sirûştî ye ji her berazekî re. Lê belê ti ajel nikare dûrî wê kêra tûj û zordar bikeve, ew kêr û tirs em ê hemî bivînin. Çêlek, beraz, mirîşk, pez, û giş, ta hesp û seg dawiya wan ne pir baştire ji ya me. Tu! Boxer, roja yekem ev hêza te sist bibe wê Johns te bifiroşe yekî ku wê serê te jê bike, wê goştê te bikelîne ji bo bide segên neçîrê. Wilo jî dema ku seg pîr bibe û bê diran bimînin wê Johns kevirekî bi qirika wan veke û wê we bavêje nêzîktirîn goleke avê... Ma ne xwiyaye hevalno ku hemû nexweşiya jiyana me ji diktatoriya mirovan e! Tenê destê mirovan ji ser me rakin wê hemî berhemên me ji me re bimînin. Di şev û rojekê de emê bibin dewlemend û azad.

Ma ka em çi bikin, çima kar bikin şev û roj bi can û laş ji mirovan re? … Ev nameya min ji bo we ye hevalno: Raperîn!

Ez nezanim ev raperîn wê kengî were, dibe vê heftiyê be yan piştî sed salên din. Lê ez dizanim weke ev pûşê di bin xwe de dibînim ku nêzîk yan dûr wê dadmendî bi cih bibe. Guh bidine wê dîtinê hevalno! Di jiyana we ya mayî de û li ser van tiştan vê nameya min bigihînin yên li pey min werin. Ji bo nifşê were vê dozê bi rê ve bibe, ta ku bi cih bibe…

Bila di bîra we de be hevalno! Ev biryar ti carî sist nebe. Divê ti kêşe we winda neke, ti carî guhdarî wan nekin eger bêjin mirov û ajel weke hev in û serkeftin û dewlemendiya wan bi hev re ye, hemû derew in, mirov cihê xwe tenê çêdikin. Bila ajel di nav xwe de bibin yek. Di astengiyên xwe de yek bin. Hemû mirov neyarên me ne û hemû ajel hevalên me ne”.

Li vir qelebalixeke mezin çêbû. Û gelek deng hatin ji nav axaftina Major de. Çar cird derketibûn ji kunên xwe û li ser dûvê xwe rûniştibûn guhdarî major dikirin lê gava segan ew dîtin pey wan ketin û cird bi lez vegeriyan kunên xwe.

Major dixwest civat bêdeng bibe, û got: "Hevalno!" bang kir Major, "Li vir jî pirsgirêkek heye divê were çareserkirin. Ajelên kûvî weke cird û kivroşkan, gelo hevalên me ne yan neyarên me ne? Ka em bixin dengdanê da. Ez vê pirsê dikim; cird hevalên me ne?"

Yekser encam xuya kir, hemî gîhane hev li ser biryara ku ew heval in, tenê çar li dijî vê bûn: pisîk û her sê seg, yên bê î ku hay ji hev hebin dengê wan bû yek. Major berdewam kir:

-"Tiştekî dî heye dixwazim bêjim, ez ê tenê dubare bikim, bila di bîra we de be ku di dijminatiya mirov û her tiştên pêwendiya wan pê re hebe çi bi du lingan be ew dijmin e û çi bi çar linga be yan

çengê wî hebin ew heval e… Ji bîr nekin tim dijminatiya me bi mirovan re ye û divê em nebin weke wan; çê nabe ajel di malan de bijîn yan di nav nivînan de razên yan cilan li xwe bikin yan wiskî vexun yan tûtinê bikşînin yan dest bidin peran, kirrîn û firotinê bikin. Hemû karên mirovan guneh in û şaş in û li ser hemî tiştî çê nabe ajelek bindestiya ajelekî dî bike, çi lawaz be çi bi hêz be çi zîrek be çi bêhiş be em giş bira ne. Çê nabe ajelek ajelekî dî serjêbike, em hemî yek in… Niha hevalno, ez ê xewna xwe ji we re bêjim. Ez nizanim çawa vê xewnê rawe bikim, xewna min ji demekê ve ye hingî mirov nebûn. Tiştek anî bîra min ku min ji zû ve ew ji bîr kiribû, berî çend salan gava ez berazekî biçûk kudik bûm diyamin û mehûyên[4] din sitranek folklorî disitirandin, wan tenê zanîbûn awaza wê û her du peyvên pêşî, lê ji mêj ve ew sitran ji bîra min çûbû. Şeva çûyî hate

[4] mehû = beraza mê

xewna min ne tenê ev bûyer, belam peyvê sitranê jî hate xewna min, bê ku berê min ew peyv dizanî, her ew peyv bi xwe bû ku ajelan distirandin. Ez ê niha bi wê sitranê ji we re bibêjim hevalno. Ez pîr im û dengê min ketiye lê dema ez we fêrî awaza wê bikim hûn karin ji xwe re xweştir bistirên. Navê wê sitranê Ajelên Englandê ye. Ez ê niha wê sitranê ji we re bibêjim hevalno."

Majorê Pîr dengê xwe xweş zelal kir û dest bi sitranê kir. Weke wî gotî dengê wî sitûr bû, baş xweş distira, awazeke şoreşgerî bû û her wiha tekoşerî bû û peyvên wê ev bû:

*Ajelên Englandê Ajelên İrlandê*
*Ajelên erd û ezman*
*Guhdar bikin li deng û bahsên min*
*Li ser zêrînîyan paşerojan*
*Nêzîk yan dûr ew roj dê werin*
*Mirovên zordar wê herin*
*Û baxçeyên şîn yê England*

*Wê bikevin bin destên ajelan tenê.*
*Wê xelekê hesinê rabin ji pozên me*
*Û zordariya li ser pişta me*
*Lêdan û êrîş wê herin û dengê qamçiyan li ser laşê me*
*Nayên bawerkirin çendî dewlemend bibin*
*Genim û ceh bîq û ka nefel û baqle û şilender,*
*Di wê demê de hemû yê me ne*
*Ronahî wê belv bibe li xaka Englandê*
*Aveke zelal wê hebe*
*Bayekî hênik wê were*
*Dema ku azadî be*
*Hemî ji bo wê rojê kar bikin*
*Bila em bimirin ji bo ew roj were*
*Çêlek û hesp qaz û elok*
*Hemî kar bikin ji bo azadiyê*
*Ajelên Englandê Ajelên İrlandê ajelên li ered û ezman*
*Guhdar bikin li deng û bahs yên min*
*Li ser zêrîniya paşerojan*

****

Van gotinên sitranê ajel dilxurt kirin û berî Major bigîhe dawîyê ajelan awaz vegerandin li pey wî, ta ajelên hov jî çend gotin têgihiştin û li gel awazê çûn, û yê zîrek ji wan peyv hemû ji ber kirin û piştî çend hewldan ajelên zeviyê gişan bi hev ra bang kirin û gotin; Ajelên Englandê. Û her yekî ji wan bi dengê xwe bang kir; çêlek ûrîyan, mirîşkan qişqiş kirin, hespan hîrhîr kirin, pez barîn û her wiha.

Gelekî kêfxweş bûn ji sitrana xwe ya ku di demeke kurt de bi durustî gotin û karîbûn şev pê de bêjin eger nehatiba birrin lê mixabin ji ber ku dengê wan pir bilind bû Johns ji xew rabû û ji wî we ye ku rovîyek hatiye. Bi lez rahişte tifinga xwe û şeş gule berdan bi ser cihê deng de, her şeş gulle ket ne dîwarê axurê de. Bi lez civata wan belav bû û her ajelek çû cihê xwe. Çûk ket ne hêlînê xwe û ajel jî çû ne ser pûşê xwe. Zevî di bistikekê de ma bêdeng.

## BEŞA 2

Piştî sê şevan Majorê Pîr di xew de mir. Laşê wî bi cih kirin di dawîya baxçe da. Ev bûyer di serê Adarê de bû. Di nava her sê heyvê pey ra gelek çalakîyên bi dizî çêbûn. Gotinên Major dîtinek û nerîneke nû ji jiyanê re dabû ajelên zîrek. Nezanîbûn kengî raperîn ya ku Major li ser axifîbû wê çêbibe, û sedemek nebû ji bo bizanibin ka wê di dema niha de çêbibe yan na. Lê dîtin ku ji erkên wan xwe amade bikin bo raperînê. Barê fêrkirin û rêxistina ajelan ket e ser pişta berazan, ku hatibûn naskirin zîrektirîn ajel di zeviyê de. Du beraz bêtir berçav bûn; Snowball û Naplyon, ku Johns dixwest wan bifiroşe. Naplyon girs bû lê xuyadikir ku har bû, û bi kêmaxaftin bû û xweş dizanî çi

dixwaze û riya xwe nas dikir. Snowball çalaktir bû ji Naplyon, bêhtir diaxifî û pêşeng bû, lê kesayetîya wî ne weke Naplyon xwegirtî û girane bû.

Berazên din hemî biçûk bûn, yê naskirî di nav wan de Squealer; rûyekî gilover li ser bû, çavên çirisandî, bi dengekî tûj, çûn û hatineke sivik, peyvedarekî pir jîr bû. Eger bi kesekî re danûsatendiba bi sivikî ji alîkî diçû aliyê din û dûvê xwe dihejand, dihişt yê beramberî wî hemû tiştê wî bawer bike; ta li ser digotin ku Squealer dikare tiştê spî reş bike û yê reş spî bike.

Van her sê berazan Snowball, Naplyon û Squealer axaftinên Major kirin rejîmek û rêbazek ji bo fêrkirinê û navê wê rejîmê kirin 'Çalakiya Ajaleyetî'[5].

Di heftiyê de çend şevan piştî Johns bi xew de diçû bi dizî diciviyan û rêbazên Çalakiya Ajaleyetî hîn dikirin û ronî

---

[5] *Animalism*

dikirin. Di destpêkê da berazan pir astengî didîtin bi ajelên gêj re. Ji ber ku digotin; divê em dilsoz bin ji Johns re û digotin: “seyda Johns êm dide me, eger ew here emê ji birçîna bimirin.” Hinekên din dipirsî: “ma piştî em bimirin me çi divê ji wan yên ku di pey me re werin?” Yan digotin: “Eger rast e ev raperîn wê were, nexwe çi pêwîste em ji niha ve kar jê re bikin?” Berazan gelek dijwarî didîtin ji bo bi wan bidin zanîn ku ev axaftinên wan li dijî Çalakiya Ajaleyetiyê ne. Pirsa herî pûç ya Mollie bû, ew mehîna spî. Yekemîn pirs ji Snowball kir:

-“Wê şekir piştî raperînê hebe?”

Snowball bi hişkî vegerand:

-“Na! Pêwîst nîne em şekir li zeviyê buxin, û şekir ji te re ne pêwîst e, ji ber ku wê sêv û şowbanê[6] şêrin hebin.”

Mollie bersiva wî da: “Û gelo ez ê rîbandê xwe li xwe bikim piştî raperînê?”

---

[6] şerabok *(en. oats)*

Snowball lê vegerand: “Hevalê! Ev rîbanda ku tu pê ve girêdayî, nîşana bindestiyê ye, ma tu tênagihê? Azadî girîngtir e û bihatir e ji van rîbandan.” Mollie qîma xwe anî lê ne ji dil.

Her wiha peyvê Moses jî bû ne kelemek û ket ne pêşiya berazan. Moses ajelê Johns bû di mala wî de xwedî bûbû û sîxurê wî bû. Gotinên ajelan digîhande Johns. Pir zanîbû biaxife. Digot: “welatekî neberçav heye, navê wî Çiyayê Şekira ye. Piştî her ajelek bimire diçe wî welatî. Cihê wî welatî li ser ewra ne, li ezmana.” Moses digot di welatê şekiran de hemû roj şûn e û bêkar in. Xak di hemî çaxan de kesk e, û şekir û şêranî li hemî deveran şîn dibe. Ajelan ji Moses hez nedikir; ji ber ku diaxifî lê ti kar nedikir. Lê hinek ji wan pê bawer bûn. Mixabin beraz diwestiyan, ta ji wan re rawe bikin ku ev welat nîn e.

Ajelên ku bêhtir li dû berazan diçû Clower û Boxer bû. Ev herdu hesp pir

dilpak, her wiha li pey biryarên hevalên xwe bûn, û ji ber beraz mamosteyên wan bûn hemî tişt ji wan bawer dikirin û ser zimanên wan digihandin ajelên din. Di hemî civînan de amade bûn û tim sitrana Ajelên Englandê distirandin, di dawiya her civînekê de.

Niha wekî tê xuyakirin raperîn zûtir wê çêbibe. Johns di xortaniya xwe de xwedîyekî bi hêz bû û cotkarekî jêhatî bû. Lê di salên dawî de rojên nexweş bi ser de hatin û têkilîyên wî nexweş bûbû, piştî perê wî di dozeke dadgehî de ji dest çû, û ji berê bêhtir vedixwar. Di hemî rojan de li ser daniştoka xwe rûdinişt li hewşê nêzî cêjtxanê û rojname dixwend û bîra di ber re divexwar. Bêhtirî caran Moses diçû rex wî, êdî Johns piskewîtek dixist nav bîrayê û dikir devê wî. Karkerên wî pir çavteng û bi xap bûn. Ji ber ku deşt tijî gîya bûbû û ban, çêkirin jê re diviya û ajel bêguhdan bû, lê karkeran destên xwe nedidan tiştekî eger Johns ne li wir ba.

* * * *

Jazeran hat û bu dema kayê. Di şeveke havînê da Johns çû bajar, li wir ma û gelek vexwar. Roja dî nivro vegeriya. Karkerên wî hîna beyanî çêlek dotibûn û piştre çûbûn neçîra kivroşka, bêî ku êm bidin ajelan. Gava Johns ji bajar vegeriya yekser çû oda xwe. Xwe dirêj kir ser nivînê, rojname danî ser rûyê xwe û di xew de çû, taa êvarî jî ajel bê êm man. Lewra nema wan kanî xwe bigirin. Çêlekekê deriyê xanîkên êm şikand bi qiloçên xwe û hemî ajel ketine hundir. Pêre pêre Johns jî şiyar bû ew û çar peyayê xwe hatin, qamçî di destê wan de li hemû aliyên ajelan xistin, di ser birçîbûna wan de. Bû sedem kû ajel hemû xwe bikin destek û ji dil hilmeyî Johns û zilamên wî bikin. Johns û zilamên wî ji nişkê ve xwe dîtin di nav poç û pehînan de, bêçare man û ketin nav piyê ajelan. Rojekê xwe di vê rewşê de nedîtibûn ji bo ku her û her li ajelan

dixistin û zordarî li wan dikirin, lê niha xwe dîtin di nav piyê wan de. Di demeke kurt de xwe dîtin derveyî zeviyê. Jina Johns hemî tişt di pencerê re dît, bi lez çend pêwîstîyên xwe xistin nav boxçeka xwe de û bi dizî reviya ji deriyekî din re. Moses jî li pey çû û reviya. Di vê demê de Johns û zilamên wî derveyî zeviyê bûn û ajelan derî pişt wan girtin. Ji ber xwe ve raperîn çêbû. Johns ma li derve û zevî bu ya ajelan. Bawer nedikirin ku wilo bi destê wan ve çêbû.

Destpêkê ajel li dora zeviyê geriyan ji bo piştrast bin ku ti mirovên veşartî nemane. Pey ra vegeriyan her tiştek girêdayi Johns û dema wî ve, weke xelekên bilbilan, zincîrên seg, kêrên serjêkirinê hemû avêtin binê bîreke kûr. Her nîşaneke bindestiyê xistin nav agir û şêwitandin.

Ajel ji dilxweşiyê û şahiyê difiriyan çaxa dîtin ku qamçî di nav agir de ne. Snowball rîband jî kirin nav agir û bang

kir: “rîband jî weke cila ye, nîşana mirova ye, divê hemû ajel tazî bin.” Dema Boxer ev tişt bihîst kumê xwe yê havînî anî, kumê dida serê xwe ji bo mêş li ser guhê wî nedeyne. Ew kum jî avête nav agir.

Di demke kurt de ajelan hemû tiştên mirovan rûxandin û avêtin. Di pey re Naplyon berê wan da odeya êm û du garis dan her yekî ji wan û du piskewît her ji segekî re anî. Piştre heft caran sitrana Ajelên Englandê sitrandin. Êdî çûn razên û ketin xeweke pir şêrîn weke ku berî niha wisa nerazabûn.

Lê weke her car zû ji xew rabûn, bi serhildana wan a pîroz hate bîra wan. Hemîyan bere xwe dan çêrîgeheke bilind ku ji wir karîbûn zeviyê seranser bivînin. Çûn cihê herî bilind ji bo zeviya xwe gişî bibînin di ronîya xweş a beyanî de. Dema dihate bîra wan ku ev zevî hemî ya wan e pir dilxweş dibûn, xwe dihlavête jor de ji bextewarî û şahî, û xwe dirêj dikirin li ser xunava beyanî, ax bêhn dikirin û devê

xwe dadigirtin ji gihaya havîne yê şêrîn. Êdi li dora zeviyê geriyan matmayî li hemî tiştî dinhêrîn, weke yekemîn car van tiştan bivînin; xaka cotkirî, rezan, gulîstan, gola avê û darên xeviyê. Te digot qey ev tişt berî niha nebûn, ne tenê wiha jî niha ev tişt hemî bû ne yên wan.

Êdî berê xwe da ne mala zeviyê. Kêliyekê bêdeng li ber derî rawestiyan. Ev jî bûye ji wan re? Lê ditrisiyan biçin hundir. Piştî demkê Naplyon û Snowball derî bi milên xwe vekirin. Ajel hêdî hêdî bi tirs ket ne hundir. Li ser kevîyên piyên xwe bi rê ve diçûn, ji odeyekê bo odeyekê. Bêdeng û bi tirs li vê xweşiyê dimêzandin; ew nivînên ji pirtûkan, cama bi ronak, qenepe û daniştoka ji çermê xas, mafura ji Bokshirê hatiye kirrin û guldana wêneya Wîktoria ya şahînşah li ser, di odeya banî da.

Divîyan vegerin xwarê lê dîtin ku Molly ne bi wan re ye. Li wê geriyan, di odeya jina Johns de ew dîtin. Rîbandeke

şîn ji yên wê danîbû ser milê xwe û li bedewîya xwe dinhêrî di awênê de. Hemiyan dengê xwe bi ser xist û pey ra derketin derve. Hinek goştê berazan li cêjtxanê hebû birin li gorekê veşartin. Boxer bi pihînekê dena bîrayê rijand. Ji bilî vê destê xwe nedane tiştekî din. Biryareke hate ragihandin ku di nav ajelan de belavbû; divê mala zeviyê bikin kevnargeh, û ti ajel ji xwe re neke cih.

Ajelan taştê xwarin. Êdî Snowball Naplyon dîsa bang li ajelan kir e. Snowball dengê xwe bilind kir û got:

-"Hevalno! niha demjimêr şeş û niv e, hê rojeke dirêj li pêşiya me ye, emê îro dest daneheva kayê bikin. Lê berî, tiştekî din heye."

Berazan dane xuyakirin got di wan her sê heyvên çûyî de xwe fêrî xwendin û nivîsandinê kiribûn, ji pirtûkên kevin yên zarokên Johns. Naplyon şiyand du qutîkên boyaxê yeke spî û yeke reş û çûne ber derîyê mezin yê zeviyê, ji ber ku

Snowball baştir bû di nivîsandinê de rahişte firçeyê xiste nav her du tiliyên xwe û navê ZEVİYA MANOR rakir û di cihê wê de nivîsand: 'ZEVİYA AJELAN'.

Ji niha û pê de dê ev navê zeviyê be. Piştî ku vegeriyan hundir Snowball û Naplyon peyja xwestin û danîne ber dîwarê dawîyê axurê, û da ne xuyakirin ew piştî xwendina her sê heyvan gihane ku rêbazên çalakiya ajeleyetiyê binivîsin di heft fermanan de. Ev her heft ferman wê bê ne nivîsandin li ser dîwar dê bibe destûra herdemî ji hemî ajelan li zeviyê û her wiha ji bo ajelên pêşerojê jî.

Snowball çû li ser peyjeyê[7] bi awayekî zehmet, ji ber ku girane ku berazek li ser pêlekanê raweste. Squealer jî di bin re rawestiyabû û qutîka boyaxê girtibû. Snowball ew ferman li ser dîwar nivîsandin bi rengekî spî û bi tîpên gir, ku te karîbû ji dûrbûna sed metreyan bixwînin. Ferman wilo dihatin:

---

[7] dirêncek *(en. ladder)*

1-Çi bi du lingan be dijmin e
2-Çi bi çar lingan be yan jî baskên wî hebin heval e
3-Nabe ajel cilan li ber xwe bikin
4-Nabe ajel li ser nivînan razên
5-Nabe ajel vexwarinên serxweşkirinê vexun
6-Nabe ajel ajelekî din bikuje
7-Wekhevî ji hemî ajelan re.

Ev ferman rast hatibûn nivîsandin. Lê tenê peyva heval hatibû danîn *hivel*, û tîpeke *s* jî paşûpêş hatibû nivîsandin. Snowball bi dengekî bilind ferman ji ajelan re xwend. Ferman bi dilê ajelan bû. Yên zîrek ji ber kirin. Snowball got:

-"Niha em herin çinînê hevalno! Bila serfiraziya me be em çinînê bikin zûtir ji dema Johns û karkerên wî."

Di vê kêlîkê de her sê çêlekan bi dengekî nexweş bang kirin, ji ber ku guhanên wan tijî şîr bûbûn. Dikirin biteqiyana. Ev bistûçar demjimêr bû nehatibûn dotin. Piştî demkê berazan

rewşa çêleka serê xwe de birin û anîn rabû şandin zerikên[8] mezin û bi serkeftin çêlek dotin. Destên berazan alîkarî wan kirin, nêzî pênc zerik tijî şîr kirin. Ajelan zerikên şîr mêzandin û girêz li devê wan gerî. Ajelekî pirsî:

-“E,e, wê çi bi vî şîrî bive?”

Mirîşkekê got:

-“Carîna Johns şîr dikire nav êmê me.”

Naplyon xwe xiste navbera ajel û zerikên şîr, û got:

-“E,e, bala xwe nedin şîr hevalno. Em ê çareyekê ji wî re bibînin. Çinîn girîngtir e. Snowball wê bide pêşiya we û ez ê piştî demekê di pey we werim, herin pêş hevalno, genim li benda we ye.”

Ajelan berê xwe dan bexçe, dest bi çinînê kirin. Lê dema êvarî vegeriyan dîtin ew şîr nema ye.

---

[8] zerik=satil (*en. bucket*)

## BEŞA 3

Ajel pir westiyan xwêdan ta ew ka dane hev lê ew karê wan vala neçû. Ji ber ku çinîna vê salê ji salê din bêhtir bû. Carina kar gelek giran bû; alav hatibûn çêkirin ji bo mirovan, ne ji bo ajelan. Zor astengi didîtin di karanîna alavên ku pêwîst bû bi du lingan.

Lê beraz zîrek bûn li ber her kêşeyekê çareyek jê re didîtin. Ji layekî din va berazan ti kar nedikir, bi tenê rêberî û zerevaniya ajelan dikirin. Zanebuna wan tişteki siruştî bu ku tenê serkêşiya bikin. Tiştê baş ew bu ku hespan her deverek ji zeviyê nas dikirin, û gelek kar çêtir û bêhtir ji Johns û zilamên wî zanîbûn, weke jêkirin û daneheva gihan.

Herdu hespan Boxer û Clower ji dil xwe diêşandin di karê xwe da. Bê guman lêxistin û qamçî nebûn. Li hawirdora zeviyê digeriyan, berazek li pey wan bû û bang dikir: her bijîn hevalno her bijîn. Yan jî digotin 'xwe xurt bikin hevalno'. Her ajelekî din karê ku jê dihat dikir, di komkirin û anîna kayê da, mirişk û ordek jî di bin rojê de diçûn dihatin bi nikilen xwe radihiştin darikê kayê. Û çinîn bi dawî kirin du rojan zûtir ji dema Johns. Ne tenê wilo, vê salê hatina zeviyê bêhtir bû ji hatina hemî salên din ji dîroka zeviyê. Û tiştek nehate avêtin û vala neçû. Mirişk û ordekan bi nikil û çavên xwe yên tûj her darikekî biçûk jî ji kayê dane hev. Vê havîne karê zeviyê bi dirust pêk hat. Ajel dilxveşbûn û bawer nedikirin dê wiha here serî. Her gepeke êm ew dilxweştir dikirin, ji ber ku ev hatin ya wan bi xwe bû, ji berhemên wan bû, ne ji destê kesê din bû. Piştî êm ji bin destê mirovan derket niha têr êm dibûn.

Lê gelek kotekî û problem jî ketin pêşiya wan; mînak: Di dawiya salê da dema genim û cehê xwe didane hev, ji ber nebûna alavan û ji ber nikarîbûn derxin derveyî zeviyê, neçar bûn li gor şewazên kevin bi devên xwe pifkin ji bo pûş ji nav derînin. Lê bi zîrekbûna berazan û bi hêza Boxer çare ji her tiştî re dihate danîn. Boxer gelek hêja û heskirîbû ji layê ajelan ve. Ji ber ku karkerekî bi hêz bû hîn di rojên Johns da, û niha karê sê hespan dikir. Rojna hemî karê zeviyê li ser pişta wî ya girs bû. Ji beyanî ta êvarî ne diravestiya. Her dem xwe dida deverê ku kar lê bêhtir bûya. Wî û keleşêrekî[9] li hev kiribûn ku wî ji xew rake nîv demjimêrî berî hemî ajelan. Çi karekî giran hebûya ji ber xwe ve dikir. Berî karê rojane dest pê kiribaya û hercar bersiva wî bo pirsgirêkekê yan kêşeyekê ev bû: “ez ê xurttir kar bikim”. Go ew kiribû slogana xwe ya taybet.

---

[9] keleşêr= dîk *(en. cockerel)*

Lê ajelên din her yekî ji wan li gorî hêza xwe kar dikir. Mînak, mirîşk û ordekan pênc destikên genim ji dewr û barê rizgar kirin. Tiştek nehate dizîn, birçîbûn nema, pevçûn û lêdan û zikreşî ku normal bûn di rojên Johns de niha çûne. Giştt hemî ajel berpirsiyar bûn, ji bilî Molly. Ji ber ber ku Molly carekê jî di dema xwe de ji xew nedirabû, û zû ji cihê kar diçû. Herdem digot kevirek ketiye ber simê wê.

Her wiha pisîk jî karê wê ne dirist bû. Ji ber ku hate xuya kirin her ku kar hebû pisîk wenda dibû. Ta demeke nema xuya dikir. Lê dema êm dihat yan jî piştî kar bi dawî dibû, derdiket, weke ku tiştek nebûye. Her car lêborîn dixwest û tiştên didan ber rûyê xwe ku dixist serê ajelan da bawerî bi lêborînên xwe li bal wan çêdikir.

Ew kerê pîr yê ku navê wî Benjamîn bû her weke xwe mabû. Tu guhertin pê re çênebûbû ji dema raperînê ve. Karê xwe

her weke berê dikir. Tu carî karê ku ne yê wî bûya nedikir. Tu nêrin nedida li ser raperînê û encamên wê. Dema jê dipirsin ku gelo kêfxweşe ji raperînê yan na, bersiva wî ev bû: “Ker, temenekî dirêj dijîn, yekî ji we nedîtîye kerek mirîye,” û ajelên din neçar dibûn ji vê bersiva tarî qayîl û dilxweş bibin.

* * * *

Di rojên yekşeman de kar nebû, taştê demjimêrekê derengtir ji rojên din bû. Piştî taştê weke ahengeke biçûk hebû, heftiyane bû. Pêşi ala xwe bilind dikirin. Snowball sermêzek kesk anîbu ji yên jina Johns wêneyê simek û sitirîyekî li ser wê çêkiribû. Ala wan kesk bû ji ber ku weke Snowball dabû xwiyakirin ev rengê kesk sembola deştên Englandê yên kesk e. Her wiha sim û strî jî nîşana komara ajela ye; di rojên dahatû da ku mirov wê nebin.

Pişti bilindkirina vê alê hemû ajel diciviyan di axurê mezin da, ji bo hevdîtieneke giştî. Di vê hevditinê de

karê hefteya bê û biryar ji bo mayindeya zeviyê dihate danîn. Herdem berazan biryar didan û ajelên din tenê deng didan li ser van biryaran. Lê yek car nezanibûn biryaran bidin.

Snowball û Naplyon çalaktir bûn di guftûgoyan da. Lê xwiya bû ku van herdukan li hev nedikirin. Her yekî ji wan pêşniyarek dabûya yê din li dijî wî radiwestiya. Çendî ew tişt normal û guman li dorê nebûyan jî weke dema ku dixwestin wî perçê zeviyê yê li pişt gulîstanê bikin cihên ajelên pîr yên nema kar dikin. Gelek guftûgo kirin li ser temenê xanenişîna[10] her ajelekî. Her civineke wan bi strana ajelen Englande bi dawi dibû, û piştî nivro ji bo ramanê nû û guhertinan bû.

Berazan odeya ku alav û hevsarên hespan wan têde bûn ji xwe re birin ji bo civînên xwe. Di êvaran de di wê odeyê de

[10] Malnişîn, karkenar, teqawît (*en. retire*)

xwendina xwe dikirin, li ser hesinkari, dardeştî û karên din yên girîng, di pirtûkên Johns de.

Her wiha Snowball gelek kar dikir ji bo ku ajelan bi rêkxistin bike û civaka ajelan çê bike. Pir çalak bû di vî warî de. Gelek encuman damezrandibûn; wekî encûmana berhemên hêkan ji bo mirîşkan, koma dûvên pakij ji bo çêlekan, çalakiya berdewamîya hevalên kovî, mijara vê çalakiyê go cirdan û kevroşkan kedî bikin. Û tevgera hiriyên spî ji bo pez.

Her wiha gelek rêxistinên din û li gel korsên xwendin û nivîsandinê. Belam di van hemî çalakiyan da bi serneketin û têk çûn. Mînak çalakîya berdewamkirina ajelên kovî yekser têk çû. Ji ber ku wan ew wekî berê kovî diman û ew tevger dikirin dema hinek bi sistî bi wan re dihat danûstendin di cî de rû ji perwerdekarê xwe distendin û bi ser xwe ve diçûn. Pisîk beşdar dibû di çalakiya perwerdeyê de. Pir karîger bû. Di rojên

pêşî de hin caran diçû ser ban dixwest xwe nêzî çûka bike û ji wan re digot: “e.e.e.e niha em hemî hevalin û hûn dikarin werin xwe li ser pirça min dirêj bikin haa”. Lê yek çûk nezîkî wî nedibû.

Lê korsên nivisandin û xwendinê baş biserketin. Bi hatina payîzê re ajel gişk fêri tîpan bûn. Ji layên berazan va wan hemîyan zanîbûn xweşik binivîsin û bixwînin, û seg fêrî xwendinê bun, lê nizanîbûn tiştekî bixwînin ji bilî heft fermanan. Lê bizina ku navê we Morîl bû dikarî ji segan baştir bixwine, û di hin êvaran de ji ajelên din re çend tişt dixwendin ji rojnamyeka ji nav gemarê anîbû. Benjamîn jî karîbû wek berazan bixwîne. Lê xwe rahênan nedikir û digot: “Ta niha tiştekî hêjayî xwendinê nîn e”.

Clower fêrî hemî tîpên elfebeyê bû, lê nizanîbû tîpan bi hev bike. Boxer heta tîpa D fêr bû. Bi lingê xwe li ser axê dinivîsî A, B, C, Ç, D, û pişt re radiwestiya û li wan dinhêrî serê xwe

dibir û dianî guhê xwe diliviyand dixwest bîne bîra xwe çi tîp pey re tê. Lê nedihate bîra wî. Çend caran fêrî E, I, F, G, H dibû lê dema fêri wan dibû A, B, C, Ç, D ji bîr dikirin. Di dawiyê da biryar da ku li wan her pênc tîpên destpêkê raweste, û her roj carekê yan dû caran wan binivîse ji bo ku ji bîr neke.

Molly ji tipên navê xwe pê ve xwe fêr nekir. Bi guhdanî navê xwe bi qirşika çêdikir û gulek du gul di rex de datanî û bi dilxweşî li hawirdora wan diçû dihat. Lê ji ajelên din piştî tîpa A fêr nebûn. Her wiha xwiya kir go ajelên gêj weke pez û mirîşkan, ordekan nekaribûn her heft fermanan jî ji ber bikin.

Pişti Snowball gelekî ramiya giha ku her heft fermana kurt bike, û bike yek hevok: "Çar lingî başin du lingî nebaşin". Digot di vê hevokê de her heft ferman bi cî dibin. Her ajelek di vê hevokê de bigihêje wê derew û bandora mirovan pûç bike. Tlûr û firinde li dij vê derketin,

çimkî ew jî bi du lingan e. Lê Snowball ji wan re şîrove kir go ne wilo ye. Snowball got:

-"Hevalno! baskên firandiyan û tlûran hene, û yên mirovan nîn in. Ji vê yekê em dikarin bêjin go bask jî weke lingan e. Tiştê mirov pê taybet e û tê pê nasîn dest in, hevalno, ew amûrên hemu iew karê xwe pê dikin".

Ev peyvên dirêj li firindeyan giran hatin. Lê qîma xwe anîn bi şiroveya Snowball. Û hemû ajelan ev hevok ji ber kirin: "Çar lingî başin du lingî nebaşin." Her wiha ev hevok hate nivîsandin jî li ser dîwarê axurê, li ser her heft fermanan ra, lê bi tîpên mezintir.

Pişti ev hevok jiber kirin, pez ev kirin weke awazekê û dema ku vala bûn karê wan nebûn dema ku li ser giya dimexeltin û bi strankî digotin Çar lingî başin du lingî nebaşin Çar lingî başin du lingî nebaşin, û her vedigerandin taa çend demjimêrên pê ku biwestin.

Napolyon yek car guh nedida çalakiyên Snowball. Digot fêrkirina biçûkan çêtir e ji fêrkirina mezinan. Piştî demekê ji çinînê Jessi û Blubel zaan, û neh cewrik anîn. Dema ku cewrik ji şîr vebûn Napolyon ew birin li odeyeke li banî ku wî tenê bikarîbû bi riya pêpelûkê here banî. Û ew cewrik li wir hiştin dûrî ajelên din, ta ku ajelan ew cewrik ji bîr kirin. Ew kêşeya şîrê çêlekan ya nenaskirî hate xwiyakirin; ku dikeve nav êmên berazan.

Sêvên zeviyê gihan û bi ba daweşiyan xwarê. Ji ajelan ve wê ev sêv bi wekhevî li wan par bivin. Lê mixabin ferman hat ku hemû sewên li ser xakê bidin hev û têxin odeya berazan. Lewra hinek ajelan kûrtepist kirin lê ajelekî jî guh neda wan. Ji ber ku hemû berazan li ser vî tiştî li hev kiribûn. Ta Snowball û Naplyon jî. Squealer şandin da ku bi ajelan ve şirove bike. Squealer ji ajelan re got: “Hevalno, ez bi hêvî me hûn vî kari weke ez eziyekê ji berazan re nebînin. Xweş bizanin gelek

ji me berazan ji şîr û sêvan heznakin, ez bi xwe jî ji wan hez nakim. Dilê me naçe wan, lê mixabin ji tenderûstiya laşê me ra û parastina wî re pêwîst in. Di şîr u sêvan da vitamîn hene, li gor zanistîyê ew pir gringin ji bo berazan. Ji ber ku em beraz bi mejiyê xwe kar dikin. Bi rêvebirin û rêxistina vê zeviyê hemî li ser pişta me ye. Bi şev û roj çavê me li xweşiya we ye, hemî ji bo we ye ku em vî şîrî vedixun û van sêvan dixun. Ma hûn nizanin ku wê çi bibe eger ku em karê xwe pêk neynin? Johns wê vegere! Erê Johns wê vegere.. Vê bizanin hevalno!”.

Squealer bi dengekî bilind bang dikir bi giştî lave ji wan dikir, xwe ji aliyekî davêt aliyekî û duvê xwe nizim dikir û pêde çû û got; “bê guman yek ji we naxwaze Johns vegere”. Li ser vê yekê heger tiştek hebe û hemû ajel li ser digihîne hev ew e ku Johns venegere. Dema ev tişt bi vî awayî hate gotin ti gotin ji ajelan re nema. Pişti xwiya bu ku giringîya

tendurustiya berazan di wan da ye hemî li hev hatin go şîr, sêv yên li ser xakê û yên bi daran ve wê ji berazan ra tenê be.

## BEŞA 4

Di dawiya havînê de agahiyan zeviya ajelan gihabû bajar. Snowball û Napolyon her roj refên kevokan bi rê dikirin ji bo tevlî ajelên zeviyên din bibin û bûyera raperîna xwe ji wan re bibêjin. Û wan fêrî sitrana Ajelên Englandê bikin.

Di vê demê de Johns rojên xwe diborandin bi rûniştina meyxanê, vedixwar, her û her gazin û gilîyên xwe dikirin ji her kesê ku lê guhdar dikir û bûyera zeviya xwe digot bê çawa ajelên nehêja zeviya wî ji xwe re birin. Cotkar û

çandevanên din dilê xwe pê dişewitandin, lê di dilê xwe de dipirsîn: “gelo dikarin vê zevîya Johns ji xwe re bibin?”

Şansê ajelan hebû ku herdu zeviyên tenişta wan ne pir bi ber û hatin bû. Yek ji wan navê wî Foxwood bû. Zeviyeke mezin bû, lê kevin û bêguhdan bû. Piraniya wê daristan bû, mêrgên wê têkçûyî bûn. Darên derdora wê di rewşeke xirab de bûn, navê xwediyê wê Pilkington bû. Piyawekî dilpakij bû, danûsitendina wî xweş bû. Bêtirê dema xwe bi masîgirtinê û neçîrê re diborand, li gorî werza salê.

Zeviya din navê we Pinchfield bû, biçûktir û çêtir bi guhdan bû. Navê xwediyê wê Fredrick bû. Fredrick zilamekî zîrek û tûnde bû. Dema xwe hemî bi kar dibûrand. Her wiha bazirganî jî dikir.

Van herduyan Fredrick û Pilkington ji hev hez nedikirin. Ji bo parastina

zeviyên xwe jî bi hev nedikirin. Herdu bi tirs bûn ji raperîna zeviya ajelan û pir hay ji xwe hebûn go ajelên zeviyên wan tiştekî nebihîzin li ser vê raperînê.

Di destpêke de kenê xwe bi raperînê dikirin. Digo: 'Wê çawa ajel zeviyekê qontrol bikin û di sedî sed di du hefteyan de wê her tişt di zeviya Manor de bi dawî bê'. Her bi Manor ew bi nav dikirin, ne zeviya ajelan li gor biryara ajelan. Digotin wê ajel bi hev bikevin û ji nêza bimirin, û piştî ku nemirin Fredrick û Pilkington peyvên xwe guhertin û tiştekî nu belavkirin. Digotin ku ajel di zeviya ajelande xwe hînî xwarina goştê mirovan dikin û xwarina goştê hev jî, û li hevdu dixin. Her wiha digotin "haa ev derket ji karên ji dijî zagonê sirûştiyê".

Lê peyvên wan hemî jî ne rast bû, derew bûn. Gotin belav bûbû zeviya ajelan pir xweş e, mirov lê nînin û ajel bi tena serê xwe, bi pergaleke dirist xwe bi rê ve dibin. Van dengû bahsan hişt ku

bandora vê raperînê li zeviyê din bibe. Gayên ku tim bê deng bûn niha weke koviyan li wan hatiye. Pez li derdorên zeviyê xwe şikandin, çêlekan şîrê xwe rijandin, hespan siwarên xwe li ser pişta xwe avêtin. Li her cihî li ser her tişti awaza sitrana Ajelên Englandê zû belav bû. Mirov pir tore bûn û ji wî tiştî enirîn. Li ser digotin go tiştekî pûç e û kenê yekî pê tê. Bawer nedikirin ajel çawa tiştekî wilo genî nas dikin û distirên. Her ajeleki ku stran digot bi qamçiyan lê dixistin. Wilo jî ajel ranediwestiyan. Her yek ji wan bi awayê xwe distirand ta ku diketin nav zingilên nêrgeh û dengên hesinên hesinkaran. Lê dema mirovan dengê vê awazê dibihîst di dilê xwe de ditirsîn. Ji ber ku guhdarkirina wê dawiya wan dianî ber çavên wan.

****

Di destpêka Çiriyapêşî de dema dexl û zad hate çinîn û danehev û hinek jê hate

helandin komek ji kevokan bi lez û bez hatin baxê Zeviyê. Jons û hemî zilamên xwe hinek zilamên din jî ketin zeviyê ji deriyê mezin ve. Berê xwe dane hundirê zeviyê. Hemîyan jî dar di destê wan de bûn, ji bilî Johns, tifing di destê wî de bû. Xwiya bû ku hatin e zeviyê vegerînin. Ajelan ji zû ve ev roj danîbû ber çavên xwe û xwe amade kribûn.

Snowball pirtûkek li ser şerê Jull Sezir xwendibû û jê hîn bûbû. Lewra parastina zeviyê danîbû ser milên xwe. Yekser fermanê xwe dan û di demek pir kurt de hemî ajeleki cihê xwe girt li gor pilana Snowball.

Dema mirov nêzîkî malên zeviyên bûn Snowball dest bi êrîşa xwe kir. Hemû kevok li ser serên mirovan difirîn û zelq davêtin serê wan. Mirovan dixwestin ji wan birevin. Di vê navê da qazên ku xwe di pişt dîwar de veşartibûn bi lez hatin cem mirovan û xwe xistin nav lingên wan. Ev tenê destpêk bû ji bo ku wan şaş

bikin. Lê bi hêsani wan qaz bi dar û botên xwe bi dûr xistin.

Snowball rabû fermana duyem da. Morill, Benjamîn û hemû pez û her wiha Snowball li pêşîya wan bi pehîn û dehf çûne mirovan. Benjamin vegeriya û hate wan bi simên xwe yên biçûk. Lê careke din mirovan zora wan birin, bi dar û pêlavên xwe yên bi hesin.

Ji nişka ve Snowball qîr kir, ev nîşana vegerê bû. Hemî ajel vegeriyan û ber bi baxê ve çû. Zilam qêrînîya serkeftinê da. Ji wan re go dijmin reviyan. Pey wan ketin û belawela bûn. Ji xwe Snowball ev tişt dixwest.

Dema mirov ketin baxçeyê, her sê hesp û her sê çêlek û berazên mayî xefk û dafik ji wan re danîbûn ku li gova çêlaka xwe veşartibûn. Ji nişka ve ji pişt wan ve hilme li wan kirin. Snowball ji wan re gotibû û wî jî bi xwe jî êrîş kir.

Dema Johns ew dîtin devê tifingê da wan û ew dane ber guleyan. Pişta

Snowball birîndar kir, her wiha pezek jî kuşt. Snowball ranewestiya û netirsiya, rahişte panzdeh keviran û avête lingê Johns. Johns ket û tivinga wî ji destê wî pekî. Lê dîtina herî tirs ji mirovan ra Boxer bû. Ew hespê girs û bilind. Radibû ser her du piyên xwe yên paş, bi hêz bi wan simên hesinî pehîn davêtin. Pehîna yekem li kurikekî Foxwood da, ew da erdê û bêhiş xist.

Dema peya ev tişt dîtin gelek ji wan darên xwe avêtin û reviyan, ji tirsa Boxer. Yekser hemî ajel pey wan ketin derdora bexçe, li wan xistin. Dehf li wan dan û pê li wan kirin, hemû ajelan her yeki bi awaye xwe tola xwe ji wan hilanî. Heta pisîkê jî ji ser banekî xwe avête zilamekî û neperûşk li qirika wî dan. Zilaman ji tirsê qêrîn dan û bawer nedikirin riya bazdanê bidest wan bikeve. Çawa rê dîtin reviyan dervî zeviyê. Di bistekê de kesek di zeviye de nema û vegeriyan di wê riya ku tê da hatibûn,

çend qaz pêy wan ketin. Zilaman bazdan ji bilî ew zilamê ku Boxir ew avêtibû ser xakê, yê ku di nav heriyê û çiravê de dirêj bûbû. Boxer bi dilêşi got: “Min nedixwest wî bikujim lê mixabin min ji bîr kiribû ku ez bi simê xwe î hesinî me. Kî wê bawer bike go min nedixwest wî bikujim”

Snowball bang kir:

“-Dilê we bi wan neşewite hevalno. Ji wan yên ku hîn birînên wan di laşê me de ne”.

Boxer lê vegerand: “Lê ez naxwazim kesî bikujim” û çavê wî ji hêsiran tije bûn.

Ajelekî qîr kir: “Kanî Mollie?” Mollie xwiya nedikir, hemî veciniqîn, bawer kirin ku zilaman ew bi xwe re birin. Lê dawî ew dîtin di odeyekê de bû xwe di nav pûş de veşartibû. Dema ku gulebaran destpêkiribû reviyabû. Piştî ajelan Molli dîtin û vegeriyan bexçe ew zilamê di nav heriyê de direjkirî bû çûbû.

Bi vê serkeftinê ajel pir kêfxweş bûn, û her yek ji aliye xwe ve bi dengekî bilind li ser vê bûyera pîroz diaxifî. Yekser festiwalek hate danîn ji bo vê serfiraziyê. Ala xwe hildan û sitrana xwe î ajelên Englandê çend caran gotin.

Ew pez ya ku hatibû kuştin binax kirin bi awayeki fermî û balkêş gul û giya li ser gorra wê çandin. Snowball axaftinek li ser gorra wê kir, tê de da xwiya kirin ku divê hemi ajel amadebin qurbaniyê ji bo zeviya xwe bidin. Piştî çend gengeşiyan ajelan bi tevahî biryar dan go gewretirîn pileyek leşkerî bi navê lehengan çêkin ji bo Snowball û Boxir. Ew herdu xelatkirin bi medeliyeke ji çend simên kevin, lê gelek hêjabûn, di mala Johns de hatibûn dîtin. Wê ev medelyan bên lixwekirin rojên yekşeman û pişûyan. Her wiha pileya duyem lehengê ajelan dan wê peza hatiye kuştin.

Gelek gengeşi kirin ka çi navî li vê cengê bikin, dawî navê wê kirin Cenga

Gova Çêlekan. Ji ber plan û fêlebaziya wan di gova çêlekan de bû.

Piştre tifinga Johns dîtin di nav heriyê da, û zanîbûn ku gelek fîşek di odeya Johns de hene. Biryar hate standin go wê tifingê û fişekan li rex aliyê dînin û di salê de du guleyan pê berdin. Carekê di 12 cotmehê de salvegera cenga gova çêlekan, care duduyan di nîvê havînê de salvegra raperînê da.

## BEŞA 5

Bi hatina zivistanê ra kêşeyên Mollie bêhtir bûn. Beyanîyan derneg dihate karê xwe û lêborîna xwe dixwest digot di xew de maye. Tim gazin dikir ji êşan bêyî ku tiştek jê xwîya bike. Xwarina wê gelek bû, ne yan nexweşan bû. Sedem ji xwe re çêdikirin û ji kar direviya. Diçû ser gola avê li wir weke hovan li sihêrka xwe ya li ser avê dimêzand. Lê di nav ajelan de gotin belav

bûbû ku tiştek mezintir ji vê tembeliya Mollie re heye. Ew jî xwiyakir ji wê roja ku Mollie di baxê zeviyê de bazdida û xwe çê didît û bi dûvê xwe yê dirêj dihejand û hinek genim dicût. Clower ew bir aliyekî û got wê:

-“Mollie, divê ez tiştekî pir giring ji te re bêjim. Vê sibê min tû dîtî li ber dîwar, te li zeviya Foxwood dimêzand û zilamekî Pilkington rawestiyabû li aliyê din. Min ji dûr ve tu dîtî ew bi te re diaxifî, tu dilxeş bûbû ku destê xwe di ser pozê te re dibir û dianî. Mollie, tu dikarî ji min re bêjî wateya vî tiştî çiye?”.

Mollie bi dengeki bilind lê vegerand:

-“e,e, ew wilo nekiriye, na, ne ez bûm, ev ne rast e” û xwe hilda û danî pê kol dikir lingê xwe li axê dixist. Clower got:

-”Mollie, li min meyzîne tu dikarî ji min re sond buxî ew zilam ne bi te re şa dibû û bi te re dileyst, destê xwe di ser poza te re dibir û dianî?”

Mollie digot: “ev tişt ne rast e” Lê nikarîbû li çavê Clower mêyzîne. Yekser gavê xwe vezilandin bazda û ji Clower dûr ket. Wê kêlîkê tiştek kete dilê Clower, bêî ji ajelên din re bêje çû li cihê Mollie nihêrî. Di hundirê wê de geriya. Di bin pûşê wê de çend gepên şekir, çend rîbandên reng reng dîtin.

Piştî sê rojan Mollie winda bû. Çend heftê borîn bizanin bê bi ku de çûyî. Lê pey ra kevokan di raporteka xwe da, da ne xuyakirin go cihê Mollie nas kirine, û ew dîtine. Li aliyê din ji bajar li derveyî firoşgehekê bû û bi erebeyekê ve girêdayi bû. Zilamekî sorik li ba wê bû. Destê xwe di ser serê we re bir û şekir didayê. Hefsarekî xweşik lê kiribû û du rîband bi lingên wê yên pêşîn ve kiribû. Xwiya dikir ku Mollie pê pir bi dilxweş bû, li gor gotina kevokan. Ji wê rojê va nema ajelekî navê Mollie anî ser zimanê xwe.

* * * *

Di çilê zivistanê de demek nexweş bi ser ajelan de hat. Ax hişk bûbû, û bûbû weke hesin. Ajelan nikarîbûn karekî di zeviyê de bikin. Pir civat çêdibûn di axura mezin de. Berazan pilan ji bo werzên werin didanî, ka wê çi bikin.

Hatibû xuyakirin ku beraz ên herî zîrekin û tenê ew biryaran didin û ew biryar divê were erêkirin di riya dengdanê. Ew pergal wê baş bûna eger ne ji wan gotûbêjên di navbera Snowball û Naplyon de.

Van herdu berazan ti car li hev nedikirin. Yekî ji wan çi pêşnîyarek li ser çi mijarê kiribûya, yê din pêşnîyareke li dijî wê dikir. Her yek ji wan yê din şaş derdixist. Û her yek ji wan çend ajelan pişta wî digirt. Çend axaftinên hişk û nerînên cuda di navbera wan de dibûn.

Di civînan da axaftinên Snowball pir xweş bûn, û di cihê xwe de bûn. Lê bêtirî caran Naplyon karîbû encamên dengdaran bîne aliye xwe. Bi taybet

dengê pezan ku herdem bi wî re bûn. Pez, di her destpêkê û di civînan da awaza xwe vedigerandin: “*çar lingî başin du lingî nebaşin*”. Her wiha dihate xuyakirin, di civînan de dema Snowball germ dibû di axaftinê xwe da axaftina wî dibirrîn bi awaza xwe ya ‘*çar lingî başin du lingî nebaşin*’.

Snowball gelek pirtûk li ser zeviyan û rêkxistina wan xwendibû û projet danîbû ji bo dahênan û pêşxistina zeviyê. Ajel fêr kiribûn go hay ji paqijiya xwe hebin. Gelek cok ji bo pîsîya wan çêkiribû ji bo zêde dema karê xwe winda nekin bi paqijkirinê ra.

Naplyon ti program nedidanî, û di ser re jî digot Snowball nagihêjî ti encamî û dema xwe winda dike bi tiştên vala ra. Lê nelihevkirina wan ya herî pir li ser aşê ba bû. Di wê mêrga mezin, ne gelekî dûrî malê zeviyê girekî piçekî bilind hebû. Ew bilindtirîn cih bû di zeviyê da.

Snowball piştî lêkolînekê da xuyakirin go ev cih baştirîn cih e ji bo aşê bayê. Ji ber ku wê karibin dînemo jê re bînin û elektirîkê bidin zeviyê, wê ronahiyê bide hundirê wan wê germ bike di zivistana de.  Her wiha wê gelek amûrên elektirîkî kar bikin yên mîna birreka diranan, cawbirê otomatîkî û mekîna ku şîr didoşe. Ajelan berî hingî tiştekî wisa nebihîstibû. Ji ber zevî modela wê ya kevin bû mekînê kevin tenê lê hebûn. Dema ku wêneyên makîneyên pir xweşik nîşa wan dikirin ajelan matmayî li Snowball guhdarî dikirin. Ew mekîneyên go wê li şûna wan kar bikin wê ajel li ser giya bimexelin, xwendina xwe bikin û fêrkirina xwe pêş bixin.

Piştî çend hefteyan plana Snowball amade dibû. Piraniya zanyarên mikanîkî ji sê pirtûkan anîbû. Ew pirtûk jî yê Johns bû. Navê wan: Hezar alîlakrî di mal da, Her mirovek karkerê xwe ye, Zanyarê elektirîkî ji bo nû destpêkirina.

Snowball lêkolîna xwe li ser banekî çêkiribû. Ew ban ji tepekî şahîk û geleki baş bû ji bo xêzkirinê. Diçû ser ban û çend demjimêran dima. Her careke ku pirtûkên xwe vedikirin du kevirên biçûk datanî li ser pirtûkên xwe ji bo ku neyên girtin, û tebeşîrek dikir nav tiliyê xwe da, sivik diçû dihat, xêzik çêdikirin, carîna jî ji dilxweşî deng derdixistin. Hêdî hêdî lêkolîna wî berfirehtir bûbû, taa nîvê bangir. Ajelan ti zîrektî di wê alepoli û pilanê da nedidît, jiber ku tênedigihştin lê matmayî mabûn. Gelek ji wan diçûn banî ji bo ku lê binerin lê hay ji xwe hebûn da pêl ti xêzê nekin û jê nebin. Naplyon tenê dima dûr û dida xuyakirin ku ew ji berê va li dijî avakirina aşê ba ye.

Naplyon rojekê hat ji bo pişgînîyê û ezmûnê bike û li karê Snowball binêre. Rabû bi granî li dora planê çû û hat ji nêzik ve li her tiştî mêzand du sê caran tuf kirê piştre demekê rawestiya dîsa

nerî û ji nişkave lingê xwe yê paş hilda û bi pilanê da mîz kir, pişta xwe dayê bêyî ti gotin bibêje.

Ajelên zeviyê bûbûne dû alî li ser mijara aşê ba. Snowball ji ajela nediveşart go ji çêkirina wî ra gelek kar divê. Pêwiste keviran bînin û bikin dîwar. Her wiha divê baberek û baweşanan jê re çêkin û pêwîste kabloyan û dinamo jê re bînin. Lê Snowball ne digot wê çawa ev tişt peyda bibin û werin çêkirin, tenê digot wê ev hemî di salekê pêk were. Hingî ajel wê di heftiyê de tenê sê rojan kar bike. Lê Naplyon digot tiştê herî pêwîst di vê demê de pirkirina zadê ajela ye, û digot: "… eger em dema xwe bi çêkirina aşê ba re winda bikin emê ji birçîbûna bimirin."

Ajel bû ne du alî, aliyek bi Snowball re digot tenê sê roj kar û aliyek bi Naplyon re digot rêweberiya hevbeş dixwest. Benjemîn bi tena serê xwe ne bi yekî ji wan re bû.  Bawer nedikir ku wê zad û

hatin pir bibe yan wê aşê ba karê ajelan kêm bike. Digot: "bi aşê ba û bê wî jiyan wê nexweş bimîne". Di ser axaftina li ser aşê ba mijara parastina zeviyê jî hebû. Raste ajelan dest hilandin di cenga gova çêlekan da lê dibe Johns dîsa hewl bide ji bo ku zeviyê ji wan bistîne û vegere. Ajel neçar bûn go ji vê mijarê ra bixebitin, ji ber ku serkeftina wan a di cenga gova çêlekan de deng dabû bajar, û vîyana ajelên zeviyên din bilind bûbû dixwestin weke wan bikin û mirov jî gelek ketibûn nava tirsê de.

Wekî her car Naplyon û Snowball li hev nekirin. Li gorî Naplyon pêwist bû ajel fêrî bikaranîna çekan bibin. Li gorî Snowball jî pêwist bû ku kevokan bêhtir bişînin zeviyên din û ajelên din fêrî raperînê bikin. Yê yekem digot eger nikaribin zeviyê biparêzin wê zevî zû bindest bibe, yê din digot eger raperîn li her cihî çêbibe ti pêwîst bi parastinê nîn e.

Ajelan guhdarî li herduyan kirin, nikarîbûn bizanin kîjan nerîn rast e, kî axaftibûya wê demê ji wî bawer dikirin, ta ku roja pilana Snowball pêk hat. Yekşema pey ra hilbijartin çêkirin ji bo ku aşê ba ava bikin yan ava nekin. Ajel tev civiyan. Snowball rabû ser xwe û xwest dest bi axaftinê bike. Lê mixabin peza her û her axaftina wî dibirrî, lê Snowball sedemên avakirina aşê ba dane xuyakirin. Naplyon rabû ser xwe ji bo ku bersiva wî bide. Bi nermî û bê ku xwe biêşîne got avakirina aşê ba pûç e û vala ye. Her wiha pêşniyar kir go ti ajel dengê xwe jê re nede û dîsa rûnişt. Tenê niv xuleyî axifî. Jê hat xuyakirin ku gelek guh nade vê mijarê. Dîsa Snowball rabû go xwest biaxifê lê pezî ew rawestandin. Rabû bi hişkî bi wan re axifî li ser tiştên başiya aşê ba axifî. Ta vê derê ajel dualî bûn, lê di vê kêlîkê de piştî Snowball ew axaftina xweş kir ajel kir sawîrekî şêrîn ku ew dilxweş kirin bi zimanê xwe yê

xweş. Da xuyakirin ku wê zevî çêtir bibe û wê kar ji ser pişta wan were hilanîn.

Dîmenên wî guhertin ji birrekan daran û cawbirên elektirîkî. Ji wan re got: "elektirîk wê pir karan ji we re bike, ji bilî ku wê her der ronî bike wê ava sar û germ her dem hebe û her wiha wê di zivistana de wê alavên germkirinê hebin."

Piştî Snowball axaftina xwe kir, berçav bû wê deng herin kîjan alî. Lê di vê demê de Naplyon rabû ser xwe û tûj li Snowball mêzan, fîtinek gelek bilind da go ti carî ew fîtin nedabû. Bi fîtina wî re dengê reyandinek bilind ji derve hat. Pêre pêre neh segê girs kete hundirê axur de. Zincîr di stuyê wan de bi lez ber bi Snowball we hatin, go bi kotekî xwe parast ji devê wan yê birçî û reviya. Di cih de Snowball xwe avête derve û her neh seg pêy ketin. Ajel matmayî bêdeng û bi tirs man. Li ber derî civiyan go li wan temaşe bikin. Snowball bi lez direviya ber bi deriyê mezin ve yê ku diçû ser riya serekî. Ta ji Snowball

dihat bazdida. Segan nêzîkî lê kirin, ji nişka ve Snowball ket, xuyabû ku wê seg karibin wî bigirin. Lê dîsa jî rabû bazdanek kir ku ticarî bazdanek wilo nekiribû. Seg her li pey bûn, yekî ji wan segan devê xwe avête Snowball ku dûvê wî gez bike. Lê Snowball xwe ji devê wî rizgar kir û xwe xurttir kir xwe di qulika ku dîwar de bû reviya û piştre nema hat dîtin. Ajel bêdeng û bi tirs vegeriyan cihên xwe yên di axurê de. Ew seg jî vegeriyan axurê.

Di despêkê de ajelan nizanîbûn ev segên kovi ji ku derê hatin, lê piştre zanîn go ev her ew cewrikên ku Naplyon ew ji dîya wan dûr xistibû. Bi tenahî ew xwedî dikirin. Erê ew hîna biçûk bûn lê seg ne pirr girs bûn, weke guran har bûn. Seg ma ne nêzîkî Naplyon û dûvê xwe ji wî re dibirin û dianîn. Weke carinan segên ji Jons re dikirin.

Naplyon û segên wi li pey wî çûn ser bilindtirîn cihê di axurê da, ew cihe ku

Major axaftina xwe lê dikir û ragihand ku ji îro pê de wê civînên rojên yekşeman nebin. Got ku ew nema grîng in, belasebeb dema wan dibe. Ji niha û pê de hemî mijarên zeviyê wê werin danîn di civatên girtî de, di navberan berazan de û bi seroktiya min. Wê ev civat taybet bin wê piştre biryarên wan bigihin ajelan. Lê dîsa wê ajel bicivin rojên yekşeman ku alê hildin, sitrana ajelên Englandê bistrînin, fermanê xwe wergirin, ji bo hefteya pey re, lê hilbijartin namîne.

Hîna ajel nehatibûn ser hişên xwe ji ber bûyera bi Snowball re çêbû bû bi ser de jî ev biryarên nû! Bi ser vê yekê jî gelek ji ajelan dixwestin li dijî van biryarên nû rabin. Lê nevêrîbûn. Boxer bi xwe jî tiştin di bin zimanên wî de hebûn. Hinekî ma û guhê xwe pişt xwe vekirin û lingê xwe çend cara li axê xistin dixwest axaftina xwe amade bike lê tiştek bi wî re dernediket. Her wiha ev yek ne bi dilê hinek berazan jî bû. Ji ber wan zanîbû

xweşik biaxife. Çaran ji wan xwe dane pêş, xwestin nerazîbûna xwe bidin xuyakirin. Lê yekser ew segên li dora Naplyon rabûn ser xwe, avûr ji wan vedan û bi zirt dengên xwe li wan kirin. Hingî ew beraz lîs bûn û mane bêdeng, û vegeriyan cihê xwe rûniştin. Disa pezî ew bêdengî birri bi awaza xwe ya navdar, çar lingî başin du lingî nebaşin û her li strana xwe vedigeriyan ta demeke baş çû ji bo derfetê nedin danûstendinê û guftûgo çênebin.

Piştî ew civat belav bû Squealer hate şiyandin da ku rêkxistinên nû ji ajelên zeviyê re bide xuyakirin û bi wan xweş bike. Ji wan re got:

-"Hevalno! Ez dibêjim qey hûn hemî di qurbaniya Naplyon de gihiştin ku ew karê mezin daniye ser pişta xwe. Hevalno! Ti carî nebêjin seroktî û rêbertî xweş e. Na, ne wilo ye, seroktî barekî giran û kurs e, kes weke heval Naplyon çêtir wekheviyê di nav ajelan de çênake.

Wê Naplyon gelek kêfxweş be ger hûn bi xwe biryarê xwe bidin. Lê hûn biryarê nedirust bidin hingî emê çi bikin? De ka bêjin min, eger hûn li pey Snowball çûbûna ji bo aşê ba yê pûç, gello we yê çi sûde jê dîtibûya. Snowball yê ku hûn hemî zanin neçêtir bû ji tewanbarekî."

Ajelek rabû û got: "Snowball bi dilêrî û bi xurtî şer kir di cenga gova çêlekan da."

Squealer lê vegerand: "Dilêrî tenê têrî tişteki nake, dilsozî û sozdari giringtir e û li ser cenga gova çêlekan ez dibêjim wê demek were emê bibînin go me rolek ji Snowball mezintir dabûyê. Aniha divê yek ji we ji rê dernekeve û gotina me neşkîne û hemî bi ya me bikin hevalno. Gaveke şaş û ne di rê de hûn bidin wê dijmin me bişkîne, û bê guman hûn naxwazin Johns vegere hevalno!."

Ajelan nedixwestin Johns vegere, lewra ev guftûgo bi dawî kir. Ajelan di dilê xwe de digotin eger hilbijartin wê Johns vegerîne nexwe na, hilbijartin

nabe. Li vir Boxer nema pir hizir kir û bi bawerî got: "ger heval Naplyon wilo dibêje nexwe ya rast ev e." Û piştre ev bû dirûşma wî ya her car: “Naplyon tim rast e” li ber dirûşmiya wî berê “ez ê xurttir kar bikim”.

* * * *

Bû behar û bayê xweş hat, rewş hate guhertin. Dergehê wî banî ku Snowball pilana aşê ba di ser çêkiribû mabû girtin. Û Ji ajelan we ye pilana wî jî ji ser hatiye hilan û çûye.

Her yekşem di axurê mezin de digihane hev ji bo fermanên heftiya bê bêne wergirtin. Biryar hatibû stendin her weke ahengek fermî diviya go ajel bi rêzgirtin, berî bikeve axurê, riya xwe bi xoqê Majorê pîr bixin. Ew xoqê ji bin axê hatibû derxistin û ji goşt hatibû paqijkirin. Li ser maseyeke ji sifir, rex tifinga Johns hatibû danîn.

Di van rojan de ajel nema weke berê diciviyan. Naplyon, Squealer û berazekî din navê wî Minimoss ê ku pir zîrek bû di çêkirina stran û helbestan de, rûdiniştin ser cihekî bilind beramberî ajelan û her neh seg li dora wan bûn. Naplyon bi dengekî hişk û fermî ferman didan û piştî ku carekê tenê strana ajelên Englandê dixwendin civîn belav dibû.

* * * *

Piştî yekşema sêyemîn ji çûyîna Snowball ajel matmayî man dema ji Naplyon bihîstin go wê aşê ba were avakirin. Û tu sedem jî nedane xuyakirin ji guhertîna nerîn û ramanên xwe. Tenê ajel agahdar kirin wê avakirina aş, karê wan pirtir bike û wê biwestin her wiha para wan ji êm kêmtir bibe. Û da xuyakirin go pilana wan amade ye, ta xala dawî jî. Wê komek beraz rêveberiya wan bike ji bo diristkirina kar. Her wiha

hinek tiştên din jî hene ku bi hêvîye ku wê avakirin piştî du salan pêk were.

Di wê şevê de Squealer bi tena serê xwe çû nav ajelan û ji wan re şirove kir ku ji pêşî ve Naplyon ne li dijî avakirina aşê ba bû. Lê ew bi xwe xwediyê projeya avakirina aşê ba bû, û ew pilana Snowball xêz kiriye jî, li ser ban, ew bi xwe ji nav kaxezên Naplyon dizîbû.

Ajelekî pirsî "nexwe çima Naplyon bi zirtî bi hişkî li dijî aşê ba diaxifî" Li vir Squealer di bin çava de lê niherî û bi fêlebazî got: "Heval Naplyon ne ji dil, ji qazî ve wilo dikir ta rê li ber Snowball bigre. Snowball yeki metirsîdar bû û bandoreke nebaş dikir, ta piştî Snowball çû em dikarin pilana xwe berdewam bikin, bê ti ziyan û serêşî. Û her ji wan digot navê vî tiştî tektîk e, her di xwe vedigerand digot tektîk e hevalno tektîk e".

Xwe hildida û didanî dûvê xwe dibir û dianî, ajelan nezanîbû wateya vê peyvê çi

ye, lê hingî Squealer bi dengekî tûj û bilind digot, bi ser de ji sê seg pê re bûn û diranên xwe sîqirandin, derfet nema ji ajelan re ji bilî jê bawer bikin.

## BEŞA 6

Di wan salan de ajelan mîna koleyan karê xwe kirin. Lê dilxweşbûn bi karê xwe, ta ji wan dihat bi dilsozî kar dikirin, û bawerbûn ku her tiştekî bikin ji wan re ye û ji bo nifşên li pey wan re ye, ne ji bo mirovên diz û kujer re ye.

Di bihar û havînê de heftiyê 60 demjimêran kar dikirin. Naplyon di Tebaxê de biryarek ragihand ji niha û pê va rojên yekşeman jî piştî nivro kar hebe. Wê ajel di kirina karê vê rojê de bi dilê

xwe, yê bivê wê bike û yê nexwaze nake. Lê ajelê nedihate kar di wê rojê da para wî ya zad nêvî dikirin. Ji ber ku kar di avakirina aş de hebû. Hinek karên din yê pêwist nedihate kirin û paleya wan ya wê salê kêmtir ji salên din bû. Du baxçe ji yên ku pêwist bû di havînê de were çandin nehate kirin, Ji ber ku dema wan têra wan nedikir. Bawerîyek mezin hebû di dilê wan de ku wê ev zivistan were, wê gelek dijwar be.

Aşê ba gelek astengî ji wan re derxiste. Li rexekî zeviyê cihekî baş hebû ji deranîna kevirê kilsî, gelek xîz û çimento jî hebû. Êdî hemû pêwîstiyê avakirinê hebû. Dima ku van keviran li gor daxwaze xwe çawan bibirrin û amade bikin ji bo avakirinê. Û ji ber kû ti alav û çare nebû ji bilî yên mirovan berê bikardianîn ajelan nikarîbû bikarbînî, ji ber nikarîbûn li ser her du lingên xwe yên paş weke mirovan raweste. Û ev yek bû pirsgirêk ji wan ra. Lê piştî çend

hefteyan ji hewildanên bê sûde, dîrokek û çareyek kete bîra yekî ji wan de, bê çima sûde ji giraniya keviran nakin wan ji banî ve neavêjin ji bo bên şikandin û çûktir bibin. Rabûn werîsek li dora kevir pêçan û bi alîkariya mekîneyek go li serê girekî bilind bû serê werîs yê din li ser mekînê ra dibirin û bi hev re hemîyan dikşandin. Çêlekan hespan pezan û her ajelekî karîbana bi werîs bigire, ta berazan jî dema pêwist bû alikarî dikirin. Bi wî werîsî kevir hildidan ji ser xakê, ji ber gir bilind bû êdî ku berdidan ji banî ve kevir diketin û perçe dibûn bi hêsanî. Bi vî awayî guhestina keviran piştî şikandina wan hêsantir bû. Hespan perçeyên mezin dikişandin û pezî jî perçeyên biçûktir. Bi vî awayî hemî ajelan kar dikir, her yek ji wan li gor hêz û karîna xwe. Morill û Benjamîn para xwe kirin nav vî karî û beşdarî kirin.

Dawiya havînê kevir baş li ber destê wan çêbûbûn. Lê hîn têra wan nedikirin.

Êdî di bin çavdêrîya berazan de dest bi avahiyê kirin. Lê mixabin karê wan xweş bi rê nediket. Carîna rojekê tenê kevirek ji bin newalê digihandin ta serê gir. Carna kevir digihandin jor lê disa diket digindirî û hûr hûr dibû.

Bêî Boxer, yê hêza wi hembarî hêza hemîyan bû, kar pêk nedihat. Her carekê kevir bi wan re diket ajelan bang dikir û ditirsiyan bi kevir ra bikevin. Boxer dihat û diket pêşiya kevir ew radiwestand. Bêhnek kûr dikişand, simên xwe di nav axê de dibirin û bi milên xwe yên pahn ew kevir dibire banê.

Çend caran Clower, Boxer agahdar kir go çavê wî li hêza wî be, û hay ji xwe hebe, lê wî bi ser guhê xwe ve diavêt, û her digot 'Naplyon tim rast e', yan 'ez ê xurttir kar bikim'. Bi dîtina wî de ev hevok bersiva hemî kêşeyan bû. Boxer bi keleşêr re li hev kiribû ji bo sê çaryeka zûtir wî berî ajelên din ji xew şiyar bike.

Di demên xwe î vala de, yên ne pir bû, kevir dikişandin.

****

Wê havînê rewşa ajelan ne gelekî xirab bû. Tevî wî karê zor, êmê kêm, lê dîsa jî ne kêmtir bû ji dema Johns. Ji hev re digotin; "ji kêmanî ve em kar ji xwarina xwe re dikin, ne ji bo xwarina pênc mirovên tembel, lewra kar pir xweş e". Li çend cihan sistema ajela ji yan mirovan çêtir bû, karê wan kêmtir bûbû. Ji ber ku wan zanîbû wê hêza xwe çawa bikarbîne, û ji ber niha yek ajelî dizî nedikir, pêwist nebû pûş û êm ji xwe re hilînin. Lewra jî pêwîstiya hebûna deriya nebû, û ew dema ku bi vekirin û girtina deriya dibûrandin karekî din ji xwe re dikirin. Lê mixabin bi bihûrtina havînê re, dîtin ku gelek tişt ji wan kêm in; weke bizmar, têl, xwarina segan, neft û hesin ji bo simên hespan. Û nikarîbûn tiştekî ji wan li zeviyê peyda bikin, û di pey re jî tovê çandiniyê divîyan û çend amûrên kar û

bêguman amûrên kar yê aşê ba, lê kesî nezanîbû çawa van pêwîstiyan peyda bikin û pêk bînin.

Rojeke yekşemê beyanî dema ku ajel giha ne hev ku fermanên xwe wergirin Naplyon ragihand ku wê ji îro pê de li gorî polîtîkeke nû kar bike. Ji niha û pê ve Zeviya Ajelan wê bi zeviyê derdorê re bazirganiyê bike, ne ku ji bo kirrîn û firotinê, lê ji bo peydakirina pêwîstîyên zeviyê. Naplyon got: “pêwîstîyên aşê ba li ser her tiştî re ne”. Dabû pêşiya xwe kayê û beşekî ji genim jî bifiroşe. Eger di pey ra pere têra wan nekir wê vê problemê çareser bikin bi firotina hêkan li markêta navdar ya li bajar. Naplyon digot: "gerek e mirîşk vê qurbaniyê ji bo aşê ba ji ber xwe ve bikin ne weke ku min ji wan xwestiye".

Dîsa ev biryar bû pirsgirêkek ji ajelan re û gotin: “ma qey me negotibû ku em ti car bi mirovan re nadin û nastînin? Ma me negotibû ku em bazirganiyê nakin û

em pera bikarnaynin? Ma ev biryar ne hatibû stendin berî niha dema ku Johns çû?" ev pirs di nav ajelan de bi dizî belav bû. Û çar berazan ê ku dil de dijî Naplyon bûn, xwestin dengê xwe bilind bikin û bêjin. Lê yekser reyandina wan segan ew rawestandin. Weke her carê pezî dengê xwe hilda û got: "çar lingî başin du lingî nebaşin". Ew kêlika şiyarbûna wan bi hêsanî wenda bû. Di dawiyê de Napoyon ji bo wan rawestîne dengê xwe bilind kir û da xuyakirin go hemî daxwaz û danûstendinê bazirganiyê berî niha hatine mohrkirin. Her wiha ragihand go pêwîstî nîne ti ajel bi ti mirovî re bide û bistîne. Ewê bi vê danûstendinê re eleqedar be.

Parêzereki nû dest bi kar kiriye, navê wî Wymper e, ew jî di bajarê wan de dijî, wê vî karê ajelan pêk bîne. Wê Zeviya Ajelan bi derve re girêbide û her duşem wê were zeviyê. Naplyon gotina xwe bi dawî kir, weke hercar bi peyva "bijî

Zeviya Ajelan”, û piştî sitirana Ajelên Englandê hemû ajel belav bûn. Squealer dora zeviyê geriya di nav ajelan de û ramanên wan yên tevlihev rast kirin, û xist serê wan ku berî niha ti biryar nebû ji bo qedexekirina bazirganiyê û bikaranîna pera. Ti ferman bi vî rengi nehatibû sitendin. Yan jî dibe ku Snowball kenê xwe bi wan kiribe bi vî tiştî jî. Ajelan bawer nedikirin di destpêkê da. Lê dema Squealer ji wan pirsî: “qey we ev di xew de dîtîye hevalno! Ma nexwe we ev biryara qedexekirinê ji ku derê ve aniye?” Li vir ajel ma ne bêdeng, ji ber ku nehate bîra wan ku tiştekî wilo nivîsandî heye.

Weke ku li hev hatibûn her roja duşemê Wymper dihate zeviyê. Zilameki hûrik, temenê xwe ne pir mezin bû. Ne ji zû va dest bi karê parêzeriyê kiribû. Lê baş zane û jîr bû, ta xwe bi vî karê zeviyê ve girêdabû. Gava dihat û diçû ajelan bi tirs li wî dinhêrî, ta ji wan dihat xwe dûrî

wî dikirin. Lê ev rewşa nû cihê serbilindayîyê û dilxweşiyê bu ji ajelan ra; dema ku didîtin Naplyon yê li ser çar lingan fermana dide Wymper yê ser du lingan.

Pêwendiyên ajelan niha bi mirovan ra ne weke berê bû. Mirov niha ne tenê ji zeviya ajelan ne xweş bû her wiha kîna wê ketibû dilê wan de. Her mirovek didît ku ji sedî sed wê rojek ev zevî vala bibe û were girtin û hemî ajelên tê da wê ji birçîna bimirin. Û li ser her tiştî ra wê aşê ba yê ku li ser diaxifin têk here. Her ku li cihekî dicivîyan digotin: li gor awayê zanistî û bi cih dikirin ku nêzîk yan dûr ev aş wê biherife were xwarê yan eger neherife, kar nake.

Di ser vê de ji bi bêdilê xwe mirovan xwe gunce dikirin li gor vê rewşa nû, ku ajelan bi serkeftin xwe birêvebirin û zevî bi navê wê yê nû bi nav dikirin. Jê re digotin zeviya ajelan, nema digotin zeviya Manor û nema ti guhdan da ne

Johns yê ku bê hêvî bûbû ji vegerandina zeviya xwe. Çûbû li aliyê din yê bajar dima. Ti danûstendina ajelan bi mirovan re nebû ji bilî Wymper. Lê hatibû belavkirin ku wê Naplyon bazirganiyekê bike bi Pilkington re, xwediyê zeviya Foxwood. Yan jî bi Fredrick, xwediyê zeviya Pincfield. Lê rastiya vê yeke ne sedî sed bû.

Di vê navê da berazan cihên xwe guhestin mala zeviyê. Cihê xwe li wir girtin li şûna Johns û jina wî. Careke din ji ajelan ve hate xuyakirin û anîne bîra xwe ku fermanek hebû li dijî vî tiştî. Lê dîsa Squealer xwe xiste nav û gote ajelan, pir girîng e ku beraz li odeya rûne û divê karê xwe li cihekî bê deng bikin. Lê ne bi dilê ajelan bû ku beraz çû ne odeyan. Ne tenê ev, berazan zadê xwe jî li çejtxanê dixwarin û hemî karê xwe di malê de dikirin. Her wiha di nav nivînan de jî radizan.

Boxer ev yek di ser xwe re borand bi gotina xwê ya her car: “Naplyon tim rast e”. Lê Clower, ev tişt pê ne xweş bû, ji ber ku hate bira wê ku tiştekî nemaze bi nivîna heye di nav heft fermanan de. Rabû çû li ber dîwar rawestiya û xwest wan heft fermanan bixwîne. Lê tiştek pê re derneket, êdî bang li Morill kir.

Dema Morill hat gote: “Morill, ka fermana çaran ji min re bixwîne, ne dibêje çê nabe ajel li ser nivînan razin?”

Morill bi giranî xwend: “Na-be- a-jel-li-ser ni – vî – nan - bi çer – çe – fê - razin”.

Nehate bîra Clower ku tiştek li ser çerçefan hebû. Lê eger nivîsandiye li ser dîwar, nexwe wilo ye.

Squealer di wê kêlîkê de li wir bû, bi du-sê segan re, bersiva her tiştî da. Squealer got: “We bihîst ku beraz çûne mala, û li ser nivîna razane, û çi pê ve heye? Ez dibêjim, hûn dizanin ku ferman dijî razana li ser nivînan nîne, ma nivîn çi ne? Nivîn cihê razanê ne, baglîfek ji

pûş jî nivîn e. Ev ferman li dijî çerçefa ye, ji ber ku mirovan çerçef çêkirine. Me çerçef rakirin ji ser nivînan û tenê bitûyan bi ser xwe de dikin, bi rastî nivîn xweş in, lê em bi xwe dilxweşiya xwe nabînin. Hevalno! Ji min bawer bikin, dema ez bêjim ku mejiyen me bi şev û roj kar dike û ti şûdanê nade xwe. Ma qey hema hûn nahêlin em xweşiya nivînan jî bivînin? Hevalno, divê hûn hinek dema xweşiyê jî bidin me, ji bo ku em karibin karên xwe bi rê ve bibin. Bê guman ajalek ji we naxwaze Johns vegere!"

Yekser, dema navê Johns kete guhê wan ajelan bi ya wî kirin û nema li ser razana berazan di mala zeviyê de axifîn. Piştî demekê hate ragihandin ku wê beraz demjimêrekê derngtir ji ajelên din ji xew rabin. Ajelek jî li ser vê yekê neaxifî.

****

Bi hatina payîzê re ajel westiyabûn. Lê pê kêfxweş bûn, salek pir dijwar û asteng

di ser wan de çû,  û piştî firotina beşekî ji kayê û genim hinekî êm û zadê ajelan di kogehê de kêm bûbû. Lê aşê ba kete cihê her tiştî. Nêzîkî nîvê aş ava kiribûn. Piştî paleyîyê geş û hewa ziwa bûbû, û ajelan kar ji berê bêhtir dikirin. Didîtin ku her rojekê çûn-hatina xwe pirtir bikin wê dîwarê aş rêzekê bilintir bibe.

Boxer bi xwe jî di êvaran de ji ber xwe ve derdiket û demjimêrekê yan bêtir jî kar dikir, li ber roniya heyvê. Ajelan di demê xwe yên vala de li dora aşê nîv avakirî digeriyan, bi hezkirin li dîwarên wê yên asê û qayim dinhêrî. Û diman lê hay çawa tiştekî wilo asê û hêja ava bike. Tenê Benjamîn ê pîr ne dida xuyakirin ku bi vî aşî dilxweş e. Weke her car ew gotina xwe ya nezelal bikardianî, ewa digot: “ker, jiyaneke dirêj dijîn”.

* * * *

Çireyapaşî hat, û bayê başûr-rojava rabû, avakirina aş rawestandin. Ji ber ku geş û hewa şil bû, nekarîbûn çimento çêkin. Şevekê ji şevan bayekî gelek xurt û dijwar rabû. Digotin qey xanî diheje, gelek kerpîç û qafik ji ser banan firî. Mirîşk ji xew rabûn û kirin qij qij. Ji wan ve ye tevan bi hev re xewneke nexweş dîtibûn, di xewnê de dîtibûn ku dengekî bilind yê tifingekê ji dûr ve dihat.

Serê sibehê dema ajel derketin, dîtin ew sitûna ala wan pê ve, ketiye û çend spîndarê dawiya zeviyê perçe perçe bû ne û ketine. Hîna ajelan li van deran dinhêrîn qîrek ji hemiyan derket dema çavê wan bi tiştekî herî nexweş ket; dema dîtin aş herifî ye. Ajel ber bi aş ve beziyan.

Naplyon, yê ku ji piyaseyê pê ve nekiribû, berî hemiyan giha wir. Erê wilo bû, dirêjkirî bû di xakê de çûbû. Keda wan hemî wêra bûbû. Ew kevirên şikandibûn û kêşandibûn dabûn hev,

hemî belav bûbûn. Ajelan nekarîbûn biaxifin û matmayî li serê gir man. Naplyon bêdeng diçû û dihat bi xembarî dikir gif gif dûvê wî sist bûbû. Ji aliyekî diçû aliyekî. Ev sistbûna dûvê wî nîşana tûrebûna wî bû.

Piştî gellekî ponijî ji nişkê ve axifî û bi dengekî nizim got: "-hevalno hûn zanin kî ev kiriye? Kî sedema vî tiştiye? Ma hûn dizanin kî dijminê me ye? Yê ku bi şev hatiye û aşê me wêran kiriye?"

Ji nişkê ve dengê xwe hilda û stûr kir û got: "Snowball! Snowball ji zikreşiya xwe ev tişt kiriye dixwest pilana me rawestîne û tola xwe ji me bistîne piştî me berda wî, ew ê bê ol êwarî bi dizî hatiye û keda me î salekê bi avê de berdaye. Hevalno, ez niha fermanekê ji bo serjêkirina Snowball didim û çi ajelekî go tişteki ji ser wî bîne ez ê nîv zembîl sêv bidimê û yê ku wî bi xwe bîne ez ê zembileke sax bidimê".

Ajelan bawer nedikirin ku Snowball sedema vî tiştî ye. Lê bi ser de jî bi lezê ketin ka wê çawa cihê Snowball bibînin, wî bigirin û bînin. Ji nişka ve şûna piyê berazekî dîtin piçekî dûrî aş, gişka da dû wê şopê ji bo ku nasbikin dawiya wê li ku ye. Lê gîhan kortekê di bin dîwarê zeviyê de.

Naplyon xwe engirand hebe nebe ev dewsa lingê Snowball e, û da xuyakirin ku Snowball ji aliyê zeviya Foxfood ve hatiye.

Naplyon bi dengeki bilind gote wan: “hevalno li min guhdar bikin! hevalno li me dereng nekin û dûdirêj hev nekin karê me heye em ê îro careke din dest bi avakirina aş bikin û em ê zivistanê giş karê xwe bi rê ve bibin. Baran be yan tavik be, şilî be yan ziwayî be, dibê ê bê ol bizanibe nekarin karê me rawestîne bi hesanî. Hevalno bila di bîra we de be, divê ti rawestin di karê me de çê nebe.

Divê di pêş de biçê, pêşkevin hevalno, her bijî aşê ba, her bijî zewiya ajelan”

## BEŞA 7

Zivistaneke nexweş û dijwar bû geşûbayekî bi ba û bahoz bû û berf û teyrok bi ser wan de hat. Di pey ra sermayek hişk ma ta dawiya Sibatê. Ajelan tiştê ji wan hat karê xwe kirin di avakirina aş de. Û zanîbûn her kesekî derveyî zeviyê li benda wê bû, ka wê çi bi serê wan were. Bê guman ew mirovên zikreş wê dilxweş bibin ku aş zû neyê avakirin. Mirovan bi xwe jî bawer nedikirin go Snowball sedema herifandina aş, û ji hev re digotin 'aşê ba ne asê bû û dîwarê wî tenik bû, ji lewra ketiye.' Lê ajelan zanîbûn ne ev e sedema

ketina wî, lê wilo jî biryar dan go dîwaran sê caran stûrtir ji berê. Ji ber vê jî dibê keviran bêhtir bidin hev. Lê demeke dirêj berf di newalê de mabû û bûbû gol, nekarîbûn ti karî li wir bikin. Êdî piştî zwa bû hinekî pêşketin çêbû, lê wê carê ajel ne pir dilxweşbûn weke berê.

Sar bûn û bêhtirî caran jî birçî bûn. Tenê Boxer û Clower mabûn dilxweş, Squealer pir gotinê xweş digotin li ser birûmetiya kar û xweşiya wî, lê ajelan hêza xwe di hêza Boxer de didîtin, û berdewamiya wî di kar da û gotina wî ya herdem digot “ez ê xurttir kar bikim”.

****

Di çile de zadê wan ber bi kêmbûnê çû. Her car para genim kêmtir dibû. Lewra hate ragihandin wê kartol bikeve cihê genim, lê mixabin dîtin beşê herî mezin ji kartolan di seqemê da têk çûbû, ji ber ku xweşik nehatibû nixumandin. Kartol nerm bûbû û rengê wan guherî bû, û beşeke hindik ji wan dihate xwarin. Ta

çend rojan tiştekî ajelan nebû ku bixun ji kelpik û pûş pê ve. Birçîbûn bi ser wan de hat. Divîyabû vî tiştî veşêrin ji kesên derveyî zeviyê, ji bo ku wan dilxweş nekin. Çimkî mirovan piştî ketina aşê ba derew derxistin li ser zeviyê û digotin va ye ajel hemî ji birçîbûnê û nexweşiyan dimirin, û herdem bi hev dikevin û goştê hev dixun. Naplyon têgihişt ku eger ev tiştên li zeviyê çêdibin belev bibin wê encamên pir nexweş bibe. Êdî hişt Wymper gotinên cuda û nerast belav bike li ser zeviyê.

Di vê dema dawî de pêwendiyên ajelan bi Wymper re kêm bûn. Lê niha hinek ajelên ku hatin hilbijartin û bêtir jî pez ji wan hatibûn xwestin ku xwe nêzîkî wî bikin û têbigihînin go qeyrana xwarinê kêm bûye. Her wiha Naplyon ferman da ku ew denekeyên li odeya xwarinê gişt tijî ax bikin û genin an çi mabe ji zad û xwarinê li ser deynin. Û ji qazî ve Wymper di odeya xwarinê re dibirin û

dianîn, ji bo van denekan bibînî. Wymper jî her belav dikir di nav civakê de ku kêmasiya xwarinê nîn e li Zeviya Ajelan. Lê çawa be piştî çendekê xwiya kir ku xwarin ji ku dewerê mabe bînin.

Ji vê demê de Naplyon kêm xwiya dikir, her û her di odeya xwe de bû ya ku li ber deriyê wê seg radiwestiyan, yek ji dîtina wan ditirsiya. Naplyon dernediket ji bilî boneyên fermî. Ew cara ku derket jî şeş seg li dora wî bûn. Eger yek nêzîkî wî bûbaya dirêyan û xwe zevt kirinê, û rojên yekşeman jî nema Naplyon derdiket. Fermanên xwe bi rêya berazekî din digihande ajelan, bêtir jî bi rêya Squealer.

Rojeke yekşemê Squealer ragihand ku divê mirîşk hêkên xwe bidin dest. Ji ber ku Naplyon peyman bi Wymper re girêdaye ku wê her heftî çarsed hêkan bide wî, ji bo firotinê, ji bo ku bikaribin bi perên wan xwarinê ji zeviyê re bikirin, heta ku havîn were û rewş çêtir bibe.

Dema mirîşkan ev yek bihîst bi xwe nexweş anîn û qir qir kirin. Erê berî niha ji wan re hatibû gotin lê wa ne ye vê qurbaniyê bikin, lê bawer nedikirin wê bi rastî were xwestin. Xwe amadekirin ji bo biharê hêkan bikin, lê firotina hêkan weke kuştina wan e.

Ev cara yekem piştî çûna Johns ku raperînek çêbû bi seroktiya sê mirîşkên xurt û ciwan. Go xwestin Naplyon ji biryara xwe vegere. Li hev hatin go bifirin banî ser depên ban û hêkê xwe li wir bikin. Lê mixabin hêkên wan diketin û dişikestin. Êdî Naplyon bi lez bi dilekî hişk qurs ferman da go hew zad bidin mirîşkan û çi ajelên zad bigihîne wan wê were serjêkirin û wê seg li ser vî tiştî zêrevaniyê bikin. Mirîşkan pênc rojan xwe girtin lê piştre nema xwe girtin. Ji ser depan vegeriyan cihê xwe, lê piştî ku neh mirîşk mirin û laşên wan di dawiya zeviyê de veşartin û hate belavkirin go bi êşa mirîşkan mirinin.

Winpêr tiştek ji vê yekê nebihîst û hêk di dema xwe de wergirtin. Her heftî dihat û hêk dibirin.

Hîna tiştek li ser Snowball nehatibû xuyakirin. Lê dihate gotin xwe di zeviya Foxwood de yan jî di ya Pincfield de veşartiye.

Naplyon piştî demekê pêwendiyên xwe bi zeviyê din re baştir kirin. Ji ber ku dixwest rewşa xwe û ya zeviyê baştir bike. Weke mînak li zeviyê komek dep hebû, ji deh salan ve li wir bû. Winpêr ji Naplyon re pêşniyar kir ji bo ku wan depan bifiroşe, ji ber ku Fredrick, Pilkington herduyan dixwestin wan depan bikirin. Naplyon nema zanîbû bifiroşe kê û nikarîbû birayara xwe bide. Her careke go wan depan bifiroşe Fredrick, dibihîst ku Snowball li zeviya wî xwe veşartiye. Yan eger gotiba wê bifiroşe Pilkington dibihîst ku Snowball xwe li zeviya wî veşartiye.

****

Di rojeke biharê da agahiyek nexweş hate belavkirin, ku Snowball di şev de bi dizî dikeve zeviyê. Vê yekê ajel gelekî tirsandin û nema kanîbûn xweşik xew bikin. Ji ber ku bihîstin go her şev di reşiyê de tê û her tiştê nebaş dike. Genim didize, şîr dirijîne, hêkan dişikîne, pêl tova çandiniyê dike û dev li mêweyên dara dike. Her tişteki nebaş dibû diket stûyê Snowball. Eger pencereyek şikestibûya yan coka avê hatibûya girtin bêguman digotin Snowball wilo kiriye. Û dema kilîta dergehê zad winda bû ajelên zeviyê gişan gotin go Snowball bi şev hatiye û avêtiye bîra avê, û ser vê biryarê man piştî ku kilîta xwe dîtin jî. Her wiha çêlekan digot Snowball bi şev hatiye û şîrê wan dotiye.

Naplyon biryar da go divê lêkolînekê bikin li van nebaşîyên Snowball. Naplyon bi segên xwe re li dora zeviyê û di hundirê xaniyan geriya. Ji bo ku dilê wan rihet be û baştir bizanbin. Her wiha ajelên din jî

bi rêz li pişt wî bûn. Her çend gavan Naplyon radiwestiya û xak bêhn dikir, ji bo ku cihê piyê Snowball bibîne, digot ku dikare bêhna wî nas bike. Her tişt bêhn dikir, her qurçikek li axurê, li govê, li kozikê, li bexçê çandiniyê, û li her dewera ku nêzîkî şûna piyê Snowball ba, poza xwe dida erdê û çend caran bêhn dikir û bi dengekî tirsnak digot: "Snowball, li vir bû ez karim bêhna wî bikim" û her careke navê Snowball gotibûya wan segan dengekî xwînxwaz derdixistin û diranên xwe tûj dikirin û tirsek dixistin dilê wan ajelên dora xwe yên ku Snowball ji wan re bûbû weke xewneke nexweş û bi tirs. Te digot qey destê xwe dike qirika wan û her tiştê nebaş bi wan dike.

Êvarî Squealer ew li hev civandin madê wî girî bû û bi tûrayî ji wan re got: "Hevalno! Tiştekî pir xirab hatiye bihîstin û hatiye naskirin go Snowball xwe firotiye Fredrick, xwediyê zeviya Pincfield, ê ku pilan dike jibo êriş û hilme

î me bike û zeviya me ji me bistîne. Snowball wê rêberê êrîşa wî be, û hîna tiştekî xirabtir jî heye; ji me we bû go Snowball ji dil bi me re bû di raperînê de, û dilşewatê me bû, lê em şaş bûn hevalno. Gelo hûn zanin sedema rastî çi ye? Snowball ji pêşî ve sixurê Johns bû, bi wî re bû, ji wî re kar dikir. Me ev hemû dîtin di kaxezên Snowball de yên go li pey xwe hiştin, û niha ji nû ve me anî der, bi dîtina min ev yek her tiştî şirove dike hevalno. Ma ne me bi çavê xwe dît dixwest çawa me bişkîne û me bikuje di cenga gova çêlekan de?"

Ajel gêj bûn û mane matmayî. Çimkî ev tişt pir dûrî xirakirina aşê ba bû. Lê demek ji wan re diviya go di vî tiştî bigihin ta vegeriyan hişên xwe. Hate bîra wan bê çawa Snowball dida pêşiya wan û serkêşiya wan dikir, û her nadirawesta ta gulle kete laşê wî ji tifinga Johns û pişta wî birîndar bû.

Di destpêkê da li ser wan giran bu ku bawer bikin Snowball bi Johns re bû. Hetta Boxer yê kêm pirs dikirin jî gêj bû û li ser cihê xwe rûnişt. Serê xwe berda ber xwe û çavê xwe girtin. Gelekî ramiya ta ku têgihişt çi li dora wî çêdibe û got:

-"Ez bawer nakim! Ez bawer nakim! Snowball bi qehremanî şer kir di Cenga Gova Çêlekan da. Min bi xwe ew dît, ma nayê bira we piştre me yekser lehengê ajelan pileya yekem da wî?"

Squealer lê vegerand:

-"Ev şaşitîya me bû heval, ji ber ku me niha nû nas kir ku wî dixwest dawiya me bîne, me ev tişt di nav kaxezên wî de dîtin."

Boxer got:

-"Lê ew birîndar bû, me hemîyan xwîna wî dît."

Squealer dengê xwe bilind kir û got:

-"Belê ev tişt di navbera wan de bû, guleya Johns tenê çermê wî birîndar kir. Ev tişt di kaxezên wî de

nivîsandiyê, min nîşanî we kiribû ya lê mixabin hûn nezanin bixwînin. Ev çîrok tev de ji Johns bû ji bo ku ji şer bireve û ajel jî pê re birevin û xaka me ji dijmin re bimîne. Hindek mabû wilo bibe, lê serokê me yê qehreman heval Naplyon nehişt. Ma qey nayê bîra we çawa Johns û zilamên wî derbasî zeviyê bûn Snowball ji nişkê ve berê xwe zîvirand û reviya, pir ajel jî li pey çûn? Her wiha ma nayê bîra we dema ku tirs çêbû çawa heval Naplyon xwe da pêş û bang kir mirin ji bo mirovatiyê, û çawa diranên xwe kirin lingê Johns de? Bê guman ev li bîra we ye hevalno!."

Pê re Squealer bi lez ji aliyekî diçû aliyê din. Piştî Squealer ev dîmen rawe kirin û anîn ber çavên wan, ji ajelan re dîyar bû û hate bîra wan û anîn ber çavên xwê ku Snowball reviyabû.

Lê Boxer hîna piçekî dudilî bû û dawiyê got: "Ez bawer nakim ku Snowball ne

dilsoz bû û bawer nakim ji destpêkê ve bêbext bû. Tiştê piştre kir ez nizanim, lê ez bawerim di Cenga Gova Çêlekan de hevalêkî pir sozdar bû.”

Squealer lê vegerand bi hişkî û got: “Seroke me heval Naplyon ragihandiye, Seroke me heval Naplyon ragihandiye, ji sedî sed heval, go Snowball sîxurê Johns bû, ji destpêkê ve, erê berî kesek raperîne hizir bike.”

Boxer got: “Aah, ev tiştekî dî ye, ger heval Naplyon wilo gotiye nexwe wilo ye”.

Squealer bi qîrîn got: “Ev e dilsoziya bi rastî ye heval.”

Lê xwîya bû bi şêweyekî nebaş li Boxer dimêzand bi wan çavên xwe yên hûrik, dixwest here lê rawestiya û got:

-“Ez her ajelekî di vê zeviyê de agahdar dikim ji bo ku hay ji xwe hebe û çavên wî vekirî bin, bê guman peyayê Snowball li her derê hene, yan jî niha di nav me de hene.”

Piştî çar rojan paş nivro dereng Naplyon ji ajelan xwest ku di hevşa zeviyê de bicivin. Dema ajel gihan hev Naplyon ji xaniyê xwe derket. Her du xelatên wî bi wî ve bûn, ew ê ku xwe xelat kiribû û dabûn xwe; lehengê ajelan pila yekem, lehengê ajelan pila duyem, û her neh segên wî li dora wî bi dengê bilind dirêyan dihiştin tirs bikeve dilê ajelan. Her yek ji wan bê deng çû cihê xwe. Xuya dikir ku zanîbûn wê tiştekî kambax bibe.

Naplyon beramberî wan rawestiya û dengekî tûj derxist yekser seg pêşde çûn û bi guhê çar berazan girtin ew kêşandin ber piyên Naplyon. Berazan ji tirsa kirin hawar û guhên wan birîndar bûn, piştî xwîn kete devê segan hartir bûn, û yekser sê ji wan segan bezîn bi aliyê Boxer de. Dema Boxer dît ew tên bi aliyê wî da ew simên xwe yên mezin dane ber xwê û segek ji wan rûxan, segekî qîrek da û lûg lûg kir û her du segên din reviyan. Boxer li Naplyon nihêrî ji bo u bizanibe

ku ka bi simên xwe wî segî biperçiqîne yan wî berde. Di cih de rûyê Naplyon hate guhertin û ji Boxer re nîşan da ji bo ku wî berde. Çawa Boxer simên xwe hilda ew seg birîndar bi nalîn reviya.

Qerebalix û qîrûqîj nema. Her çar beraz bizdeha bû û mabûn bendewar û nîşanên gunehkaran di rûyê wan der xwiya bû. Naplyon gazî wan kir ji bo gunehên xwe bêjin. Ew beraz bi xwe bûn yên li dijî axaftinê Naplyon bûn di civîna yekşema çûyî de. Bê ku gelek pirsan ji wan bikin her çaran eşkere kirin ku pêwendiyên wan bi Snowball re hebûn, bi dizî ji destpêka derxistina wî hevkarî bi wî re dikirin ji bo aşê ba biherifînin, û li hev kiribûn ji bo zeviyê bixin bin destê Fredrick. Her wiha gotin ku Snowball ji wan re gotiye ku ji mêj ve bi Johns re ye. Dema axaftina xwe bi dawî kirin yekser segan dev kirin qirika wan û zengelorka wan dirandin.

Piştre Naplyon bi zird bang kir ka hinek ên din dixwazin tiştekî bêjin. Her sê mirîşkên ku raperîn ji bo hêkan çêkiribûn xwe dane pêş û dane xuyakirin ku Snowball hatiye xewna wan û ji wan re gotiye li dijî rêz û fermanên Naplyon rabin. Bi gotina wan ya dawî re segan serê wan her sê mirîşkan jêkirin. Piştre qazekê xwe da pêş û eşkere kir go şeş goşên genim dizîbûn di paleyîya sala çûyî da. Û pezekê jî eşkere kir go di gola ava vexwarinê de mîz kiribû li ser daxwaziya Snowball. Her wiha du pezan jî dane xuyakirin ku beranekî pîr kuştibûn ji ber ku gelekî dilsozê Naplyon bû, li pey wî ketibûn heta ew westandibûn bêhna wî çikiyabû û paşê miribû. Serê van gunehkaran ku gunehên xwe eşkere kirin di cih de hate birrîn. Eşkerekirin pê de çûn ber piyê Naplyon.

Atmosfêr giran bû bi bêhna xwînê ya ku hatibû jibîrkirin ji dema Johns çûyî ve. Piştî hemî tişt bi dawî bû ajelan giş ji

bilî berazan û segan bi giranî xwe kêşan derve. Hemî mane perîşan û bêzar, nema zanîbûn ku bêhtir ji çi mabûn matmayî; ji bêbextiya ajelan yên ku peywendiyê wan bi Snowball hebû an ji zordariya tolhildanê ya ku li ser bûne bîner û bi çavê xwe dîtin. Di rojên Johns de pir caran dîmenên wilo dagirtî bi xwîn hebûn, lê vê carê di navbera wan bi xwe de bû, ji çûna Johns de li zeviyê yek ajelî ajelekî dî nekuştibû, cirdek jî nehatibû kuştin.

Ajelan berê xwe dane wî girê aşê lêkirî bi hev re rûniştin û xwe nêzîkî hev kirin, ji bo ku xwe bi hev germ bikin. Clower, Morill, Benjamin, çêlek, pez û komek ji qaz û mirîşkan jî hemû, ji bilî pisîkan, ji nişka ve winda bûn, berî Naplyon ferman bide ji bo civînê. Demeke mane bê deng, tenê Boxer li se lingê xwe mabû, hêdî hêdî diçû û dihat, dûvê xwe daxistibû û her kêlîkê keserek berdida. Dawiyê axifî û got: “Ez tênagihim û nikarim bawer

bikim ev tişt li zeviya me çêdibe, bê guman ev sedema şaşiyeke me ye, çareseriya vê, weke ez dibînim divê em bêhtir kar bikin. Ji niha û pê de ez ê beyanî bi demjimêrek zû berî we ji hemiyan ji xew rabim.” Bêyî ku gotinek din bibêje berê xwe da newalê bi giranî û kevir kêşandin, berî bibe şev.

Ajelan bi bêdengî xwe li dora Clower dane hev. Ji vî girê ku li ser bûn, aliyekî baş ji bajar didîtin, û gişt zevî hemî didîtin, mêrg û çêregeha fireh ya ku diçû riya dirêj û sereke ya diçe bajar, komên kayê, dehl û daristana fireh, gola ava vexwarinê, xaka cotkirî, serê genimê nû şînhatî û banên xaniyan yên ji qermîtên sor û dûyên ji lûleyên soba derdiket.

Êvareke biharî sayî bû, giya şîn dikir, roj li ber ava bû. Ti carî berî niha zevî bi vî awayî şîrîn nedîtibûn. Pişte hate bîra wan ku ev zevî û hemî perçên wê ji wan re ye. Dema Clower li newalê dinhêrî çavên wê bi gelek tiştan diket û çavên wê

tijî hêstir dibû. Eger tiştên di dilê xwe de derxistibana, wê gotiba “ev ne armanca me bû berî çend salan dema em li ber mirovan rabûn, ev dîmenên dagirtî bi xwîn setemkarî ne ji daxwazên me bû û ne di dilê me de bûn, şeva ku Major em li hev civandin ku li ser raperînê axifîn, wêneyên ku wî didîtin civakek ji bo ajelên azad bê birçîbûn û bê qamçî, hemî weke hevdû bin, her yek kar bikin li gorî hêza xwe, yên bi hêz lawazan biparêzin”, mîna dema Clower bi xwe çêlîkên ordekan parstin di şeva axaftina Major da, ji bilî vî tiştekî din çêbû bê î ku bizanibin çima.

Demek hat ku ajelek nediwêriya tiştên di dilê xwe de bibêje, demê ku segên har û dijwar li her cihî ne. Dema hevalên wan li ber çavê wan bên serjêkirin bi sedeman karê nebaş. Bi nerîna Clower ti xweşiya raperînê nemabû, lê bi vê çendê rewş wêran be her wê ji dema Johns çêtir be û her baştire ku mirov dûr be û zeviya xwe ji mirovan biparêze. Çi bibe Clower wê

bimîne pabend û dilsoz di karê xwe de, û wê hemû fermanên ku ji wê re werin bi cih bike, wê seroktiya Naplyon pê xweş be. Lê wilo jî daxwaza ajelan ne ev e ku dibînin ne ev e karê hemî keda xwe li ser danî. Ne ev bû armanca wan dema aşê ba ava kirin û dema ku li hemberî guleyên Johns rabûn. Ramanên wê ev bûn lê gotinan alî wê nedikirin. Di dawiyê de ji bo tiştekî bêje lê gotin nedît û dest bi sitrana Ajelên Englandê kir. Ew ajelên din yên ku li dor wê rûniştîbûn bi wê re berdewam kirin. piştre sê caran sitrandin bi awazek pir giran û dil bi kul ku bi vî awayî nesitrandibûn, sê caran gotin. Squealer bi du segan ve hat tê re xwiya dikir ku wê tiştekî girîng bêje. Squealer rêzeke fermî ji heval Naplyon ve ragihand go sitrana Ajelên Englandê hatiye hilanîn û ji niha û pê ve qedexe ye. Ajel mane şaş, Morill bang kir:

-“Çima?”

Squarell bi hişkî lê vegerand û got:

-“Ti pêwîstîya wê nemaye heval. Ajelên Englandê sitrana raperînê bû û niha raperîn nemaye, kuştina wan xayînan îro kiryara dawî bû ji raperînê. Me her du dijminên xwe têk birin, yê derve û yê hindur. Me ev sitran digot bi hêvî bûn rewşek xweştir û çalakiyek çêtir çêbibe û niha em di çalakiyeke çêtir dene û rewşa me xweştir e, lewra dîyar e ku ti pêdiviya vê sitranê nemaye.”

Hinek ajelan xwestin biaxife li dijî vî tiştî tevlî ku tirs jî di dilê wan de hebû. Lê weke her car pezan bi hev re bang kirin “çar lingî başin du lingî nebaşin”.

Bistikekê pezan ev gotinên xwe berdewam kirin ta ew gotûbêj bi dawî bû, û wilo sitrana Ajelên Englandê nema hate gotin û nema kesî bihîst. Di cihê wê de Minimos helbestvan, sitranek din nivîsand, dibêje: “Zeviya ajelan zeviya ajelan, di hebûna me de ti carî tu nabîne êş û ziyan.” Her beyanî yekşeman piştî hildana alê distirandin. Lê li gori ajelan

ev sitran ti carî nedikete şûna sitrana Ajelên Englandê, ne bi gotinên xwe û ne jî bi awaza xwe.

## BEŞA 8

Piştî çend rojan tirsa wan bûyerên serjêkirinê ji dilê wan derket. Hate bîra hinek ajelan, yan jî digotin qey hate bîra wan go fermana şeşem ji heft fermana, dibêje: Nabe ajel ajelekî din bikuje. Lê wilo jî ajelekî jî ev tişt neanî bîra beraz û segan. Ji ber ku di baweriya wan de ew serjêkirina çêbû ne wek ew kuştina ku di vê fermanê de hatiye diyarkirin.

Clower ji Benjamin xwest fermana şeşan jê re bixwîne. Lê ji ber Benjamin lê vegerand û got: “ez xwe nakim nav van kêşeyan.” Clower ji Morill xwest ku bixwîne.

Nivîsandîbû: Nabe, **bêsedem**, ajelek, ajelekî din, bikuje. Ajelan hizir kir go ew her du gotinan ji bîr kiribûn, dîsa jî ev fermanek dadmendî bû ji ber sedemeke girîng hebû ji bo serjêkirina wan tawanbaran ku beşdari bi Snowball ve kiribû.

Di wê salê de ajelan karê xwe bêhtir kirin ji sala çûyî, ji bo aşê ba avakin û dîwarên wî du caran stûrtir lêkin û di dema gotibûn de wê avakirina aş bi dawî bikin. Her wiha karê zeviyê jî pê ra. Lê carîna ji ajelan dihate xuyakirin demên kar dirêjtir bûn lê êmê wan her weke xwe dima û ji dema Johns çêtir.

Squealer her yekşem beyanî kaxezek dirêj bi xwe re dianî û ji wan re dixwend. Lîsteyek dirêj li ser pirkirina êmên wan

yên ku pirttir bûne ji dema Johns. Hinek pol ji sedî dudu pirttir kirine, û hinek din ji sedî sê, û hinek ji sedî pênc. Her yek li gor rewşa wê. Ajelan jî ji neçarî bawer dikirin ji ber baş nedihate bîra wan rewş çawa bû di dema berî raperînê da. Lê di dilê xwe de bawer dikirin wê di pêşerojê de kar kêmtir bibe û êm pirtir bibe.

Di dema niha de hemî biryar û ferman bi riya Squealer yan jî berazekî din dihate ragihandin û nema Naplyon gelekî xuyadikir. Gelek gelek her du heftiyan carekê xuyadikir û wê carê jî ne bi tena xwe dihat, segên wî li dora wî bûn. Herwiha keleşêrê reş jî li pêşiya wî bû. Weke zirnevaneki berî ku Naplyon biaxife keleşêr bi dengekî bilind bang dikir: "kû ku kû kû". Li odeyên zeviyê jî cihê Naplyon taybet bû. Bi tena xwe dixwar û her û her du seg li ber deriyê wî bû û her roj jî şîvên giran dixwar û di sêniyan de. Her wiha hate ragihandin ku her sal di roja dayîkbûna Naplyon da wê

guleyekê berdin li gel wan salwegerên din; salvegera raperînê û salvegera cenga gova çêlaka.

Niha nema ajeleki navê Naplyon dianî ser ziman, bê ku bêje ‘serokê me Heval Naplyon’. Berazan navên din lêdikirin, weke; bavê hemû ajelan, tirsa di dilê mirovan da, parêzerê xaka ma, hezkerê çêlîkê ma û navên din. Her wiha Squealer hêsir dibarandin dema li ser Naplyon diaxifî û li ser hişmendiya wî û dilovaniya dilê wî û evîna wî ya kûr ji hemî ajelan ra, li her dewerê û bi taybet ew ajelên bextreş yên hîna di bindestê mirovan dijîn û zordariya wan dibînin li wan zeviyên din. Lewra bûbû tiştekî sirûştî û asayî her serkeftinek yan jî qezencek heba na Naplyon bû, û bi navê wî dihat naskirin. Carîna mirîşkekê ji mirîşekeke din digot: “bi saya serokê me heval Naplyon min di şeş rojan de pênc hêk kirin”, her wiha du çêlek li ser gola avê diaxifîn û ji hev re digotin: “bi saya

serê serokê me heval Naplyon ev av çi zelal û paqij e”.

Ev hemî axaftin û pesin, Minimos li hevdû civandin û kirin helbestek:

*Dostê sêwîyan kanîya dilşadiyê*
*Xwediyê şahîyê dawiya lawaziyê*
*Ox ox ma çi devê min şêrîn dibe dema navê wî dibêjim*
*Çavên wî yên asûde weke şahan zane ye*
*Weke roja li ezmana ye heval Naplyon*
*Tu me hemiyan hînî hunera evînîyê dikî*
*Me di rojê de du caran têr dikî*
*Me aram û dilxweş dikî*
*Tu guhdarîyê li paqijiyê û xewa me dikî*
*Her ajelekî çi biçûk çi mezin*
*Tu me gişan diparêzî û piştrast dikî heval Naplyon.*
*Ji çaxê em bi çûk bun ta em mezin bûn*
*Li ser dilsoziya te re em rabûn*
*Û yekemîn gotina me: heval Naplyon.*

Naplyon ev helbest erênî dit û xwest go li ser diwarê axur bi awakî mezin binivîsin, beranberî wî dîwarê ku her heft ferman li ser in û di rex we helbestê de Squealer wêneyek ji Naplyon re çêkîr bi boyaxa spî.

Di vê demê de danûsitendinê Naplyon ê bi rêya Wymper bi Fredrick û Pilkington re aloz bûbûn. Û hê ew koma depan ne firotibû, lê Fredrick bêtir dixwest wan bikire belam nirxekî baş bi wan nedida. Her wiha gotegotek belav bûbû ku Fredrick û zilamên wî wê careke din êrişî zeviyê bikin û wê aş biherifînin, ji ber ku çavê wî bar nedibu aş were avakirin û ta niha jî hatibû zanin ku Snowball di zeviya Pincfield de veşartiye.

Di nîva havînê de ji ajelan re hate gotin ku sê mirîşkan eşkere kirine ku pilanek bi alîkariya Snowball danîbûn ji bo kuştina Naplyon û yekser her sê mirîşk hate serjêkirin. Di cih de bernama parastina Naplyon hate danîn, bi şev çar

seg zêrevaniya textê wî dikirin û berazeki biçûk nave wi Pinky bû wê xwarina Naplyon berî wî team bike ji bo ku zanibin jahr kiriye yan na. Di heman demê da hate ragihandin go wê Naplyon wan depan bifiroşe Pilkington. Her wiha wê li gor rêkeftineke sistemkerî ji bo bêguhertina hinek berheman navbera Zeviya Ajelan û Foxwood de pêk bîne. Pêwendiyen di navbera Naplyon û Pilkington tevî ku bi riya Wymper jî bû, xweş bûbû û dostanî di navbera wan de çêbûbû. Baweriya ajelan bi Pilkington nedihat ji ber ku mirov bû lê wilo jî bi wan çêtir bû ji Fredrick yê ko jê ditirisiyan hez jê nedikirin.

****

Bi dawiya havîne avakirina aş ber bi dawî hatibû. Gotin pirttir bûbûn go wê êriş ji nişka ve were ser wan. Dihate gotin ku wê Fredrick dixwaze erîşî wan bike bi bist zilamên çekdar ve, û devê

polîsan jî dagirtibûn ji bo dema dest deyne ser zeviye û ajelan bikuje kes deng neke û nebêje çima. Her wiha gotinên nebaştir li ser Pincfield belav bûbûn û li ser reftara Fredrick ya pîs bi ajelên xwe ra. Hespekî xwe yê pîr bi lêxisitinê kuştibû. Çêlekên xwe birçî kiribûn, segekî xwe avêtibû tennurê û êvaran xwe bi şerê keleşêran şa dikir; ew berdidane hev û cûzeran bi zengelorê wan vedikir. Xwîna ajelan dikelî gava dibihîstin ku ev tişt têne serê hevalên wan. Carina dikete serê wan dixwestin ji zeviya xwe derkevin û herin erişî zeviya Pincfield bikin, mirovan jê derxînin û zeviyê azad bikin. Lê Squealer li ber wan radibû û dixiste serê wan ku lezê nekin û baweriya wan bi startjiya heval Naplyon hebe. Lê disa dijminatiya wan bi Fredrick re dima.

Beyaniya roja yekşemê Naplyon hate axurê û ji ajelan da xuyakirin go ti carî neketiye bîra wî ku wan depan bifiroşe Fredrick û got: “Bêrûmetiye ji bo min her

wiha ez dikarim bêjim bênamûsî ye jî, eger wan bifiroşim Fredrick. Her wiha ew kevokên ku difirin nav zeviyê din da ku li ser raperinê biaxifin û belav bikin fermana min ev e ji îro pê ve qedexe ye ku herin xaka Pincfield, û divê dirûşme ya xwe berê ku digotin mirin ji bo mirovatîyê biguherin û bêjin mirin ji bo Fredrick".

****

Di dawiya wê havinê de guneheki din yê Snowball hate xwiyakirin. Palehiya genim ya wê salê tijî gîya pîs bû, ji ber Snowball tovên gîyayên pis kiribû nav tovên genim, qazekê alikariya wî kiribû di vê gunehê de. Piştî ku wê qazê ji Snowball eşkere kir yekser ginyazeke jahrkirî xwar û xwe kuşt.

Ji ajelan re hate gotin ku ti car navê lehengê ajelan pila yekem nedabû Snowball, lê ev peyv Snowball bi xwe piştî cenga gova çêlekan gerand û wî bi

xwe ev tişt li ser xwe derxist, lê ne guncavê vî navî bû. Ne tenê wilo, her wiha ew di şer de tirsonek bû. Careke din ajelan anî ne bîra xwe go ev tişt ne rast e, lê Squealer yekser xiste serê wan go ew şaş in.

Di payîzê de bi mandîbûneke giran û di ber çinîne re avakirina aşê ba pêk hat. Lê hîna mekîne jê re neanîbûn, hîna Wymper danustendin dikirin ji bo kirrîna wan, tevî hemî pirsgirekan di gel zanyarî yên wan kêm bi amûrên wan yên kevin û bextê wan yên reş û pîsîtiya Snowball, karê wan di roja xwe de bi dawî bû.

Pir westiyabûn lê serbilind bûn, ajel di dora aş dizîvirîn û pir bi wan xweşik xuya dikir, û xweştir ji avakirina berê. Dîwarên wî du caran ji berê stûrtir çêkiribûn. Tiştekî nikarîbû şahiya wan bişkîne. Dema mandîbûn û sitandina di ber avakirina aş de hat ber çavê wan qîrînê serfiraziyê bi wan diket, li dora zeviye diçûn dihatin. Naplyon bi seg û

keleşêrê xwe ve hat ba aş. Naplyon bi xwe pirozbahiya ajelan kir û ragihand go wê navê aşî bîkin Aşê Naplyon.

Piştî du rojan civînek ji bo ajelan hate girêdan li axura mezin. Ajel ecêbgirtî man, dema bihîstin ku Naplyon koma depan firotin Fredrick. Siba wê Fredrick trêmpêlen bîne û depan bibe. Di wê dema ku xwiya dikir Naplyon hevaltiyê bi Pilkingtin re dikir, lê bi dizî û ji bin ve danûstendina wî bi Fredrick re hebû. Hemû pêwendiyên xwe zeviya Foxwood re birrîn û nameyên hişk ji Pilkington re şandin û kevok agehdar kirin ji bo ku neçin Foxwood, ji dêvla bêjin mirin ji bo Fredrick, ji îro pê de bêjin mirin ji bo Pilkington. Di heman demê da Naplyon ji ajelan re da xuyakirin ku ew axaftinên li ser êrîşa zeviyê hemû derew bûn, û hemû bûyerên li ser zordariya Fredrick ne rast bûn û gelekî hatibûn mezinkirin.

Di belavkirina van gotina, pilanek ji Snowball û peyayên wi bû ji ber ku niha

xuya kir ku Snowball xwe li zeviya Foxwood veşartiye û bi rastî jî ti car neçûbû Pincfield. Ew di jiyana xwe de nedîtibû. Ne weke dihate xuyakirin ku di xweşiyeke mezin di Pincfield de. Ew bi xwe van çend salan weke karkenarekî[11] dijî li Foxwood.

Beraz mabû ne matmayî ji fêlebaziya Naplyon, bê çawa bi daxuyakirina dostaniya Pilington dep bi giranî firotine Fredrick. Squealer digot, zîrektî û jîrbûna Naplyon jê re daxuyanî kirin ku divê baweriya wî bi ti kesî nebe, ta Fredrick jî. Wî jî dixwest ji bilî peran tiştekî din bide Naplyon, tiştekî navê wî çek. Ew weke kaxezeke biçûk e ji bankê, li ser nivîsandiye ku em karin pê pera wergirin. Lê Naplyon ji wî zanetir bû, qîma xwe neanî ku Fredrick depan bive ta pere nekevin destê wî. Ew pere têra kirrîna mekînan ji aşê re dikir. Bi lez dep

[11] Karkenar=malnişîn, teqawid *(en. retire)*

hatin guhestin. Piştî dep çûn ajelan civînek girêdan ji bo ku wan perê Fredrick bivînin. Naplyon li ser cihê xwe yê bilind rûnişt, her du xelatên wî bi sînga wî ve bûn û dev bi ken bû. Pere li ber tenişta wî di sêniyekê de bû. Ajel yek bi yek di ber peran re diçûn çavên xwe bel dikirin. Dema Boxer hate ber peran bêvila xwe nêzîkî wan kir û bêhn kir, bêhnêke ku berî niha nekiribû.

Piştî sê rojan qelebalixeke bi tirs ji derve hat. Wymper bi rûyekî reş bi lez kete malên di zeviyê de. Piştî ku kete hundir piştî çend xulekan dengê qîrînîyeke tûj ji aliyê odeya Naplyon hat. Agahî li zeviyê belav bû weke agir li pûş belav dibe û hemiyan bihîst ew pera qelepjenî bûn. Fredrick ew dep bê tiştek ji wan sitendin û ji xwe re birin. Yekser Naplyon ajel civandin û ragihand ku divê Fredrick were kuştin, got: “eger wî bigirin divê wî bi saxî bikelîne ta bimire!”

Ajel agahdar kirin ku piştî vê bêbextiyê wê tiştne kambaxtir bibin.

Di çi kêlîkê de be li waneya Fredrick û zilamên xwe werin me. Zêrevan û çavdêr li der dora zeviyê hatin danîn, her wiha bi riya çar kevokan name hate şandin ji Foxwood re ji bo lihevhatinê û bi hêvî bûn disa pêwendiyên xwe bi Pilkington re xweş bikin.

Beyanîya roja din êrîş giha wan. Ajel di ser taştê de bûn dema ajelên zêrevan bi lez hatin û gotin: "wa Fredrick û zilamên xwe gelekî nêzîk bû ne". Yekser ajel dilêrî ketin pêşiya wan lê vê carê serkeftin zû bi dest ve neanî mîna cenga gova çêlekan. Ji ber ku vê carê 15 zilam bûn û nivê wan çekdar bûn û dest bi teqandinê kirin berî ku bikevin hundirê zeviyê. Ajelan nekarîbûn xwe li ber gulleyên wan biparêzin. Tevî ku Boxer û Naplyon ew didane pêş lê mixabin vedigeriyan, hinek ji wan birîndar bûbû. Fredrick û zilamên xwe her pêş ve dihatin ajel paş diketin

xwe dixistin pişt dîwaran û avahiyên zeviyê û bi tirs ji paş qulan de dimêzandin.

Dijmin mêrga mezin û aşê ba xistin destê xwe, di wê kêliyê de hate xuyakirin ku Naplyon jî hest kir ku ew têk çûn û şikestin, di qulên dîwar ve dinhêrî beyî peyvek ji devê wî derkevê û dûvê xwe ditewand.

Agahî bi dilşikesti û bi xemgîini ji Foxwood re rêkir. Ji xwe re digot eger Pilkington û zilamên wî bigîhin wan dibe ku biserkevin. Di demeke kurt de her çar kevokên bi rê kiribû, vegeriyan û kaxezek biçûk di nav nikilê yekê ji wan de bû. Ser nivîsandibû 'qenc û xweş di serê te de hat, di heqê te de ye'.

Di vê navê da Fredrick û zilamên xwe li ba aş bûn, ajelan li wan temaşe dikir. Qîrîn bi wan ket dema dîtin du ji wan zilaman rahiştin çakûç û hesinên tûj û ber bi aş ve çûn da ku wî biherifîne. Naplyon bang kir: "vala ye, aş naherife,

me dîwarên wî pir stûr lêkirine û bi van amûran nakevin, eger heftiyekê jî lêxin nikarin bînin xwarê, netirsin hevalno!”.

Lê çavên Benjamin li zilaman bû, yên alav di destê wan de. Wan kortikek kolan nêzîkî bingeha aşê. Çavê Benjamin ma ne beloq, û bidengekî ketî bang kir: “Min zanî bû, ma hûn nabînin çi dikin? Pişt re wê dermanê teqandinê ji bo herifandina aşê bixin kortikê!”. Ajel bi tirs li benda wan bû. Nedibû niha ji cihê xwe derkevin û nevêriyabûn ji pişta dîwaran derkevin. Bistek derbas bû wan zilaman bazdan, her yek bi alîkî ve çû û dengekî gelek bilind derket. Kevok yekser firiyan ezmana.

Hemî ajel ji bilî Naplyon serê xwe kirin bin ûrên xwe. Dema serê xwe hildan ewrekî mezin ji dûyê reş li ser cihê aşê ba de bû. Hêdîka ba ew ewr dûr xist, aşê ba nemabû.

Di vê kêlîkê da wêrektî bi ajelan re çêbû, û tirs nema. Ew bêhêvîbûna wan ya

berî demekê hemî bû agir û kete xwîna wan. Ajel tûj bûn li dijî vî karê pîs û rûreş. Qîrek bi hêz û xurt ji bo tolhildanê dan bê î ku li benda ti fermanê bimînin, pêşketin û rast berê xwe da ne dijmin. Vê carê guh neda guleyan ku weke zîpikê li ser serê wan dibarî.

Cengeke hov û giran bû, zilaman her û her gulle berdidan û ger ajel nêzîk bûbûna bi darên xwe yên dirêj û bi potînên xwe li wan dixistin. Çêlekek, sê pez û du qaz hatin kuştin û hemî ajel birîndar bûn. Naplyon bi xwe jî yê ku li pişt wan bû ferman dida ne wan bi birîneke sivik birîndar bû.

Her wiha zilam jî nema ne bê birîn, serê sê zilamn jî hate şikandin bi simên Boxer, yekî din jî zikê wî du perçe bû bi qiloçên çêlekekê. Cessi û Bluebel şelwerê zilamekî dî jê kirin, û gava her neh segên ku Naplyon ew li hawirê zeviyê danîbûn, hatin bi dengekî zirt reyîn tirs xistin dilê mirovan yên ku dîtin wê dora wan were

girtin. Wê hingê Fredrick bang kir go birevin hîna derfeta wan heye û bi lez û bez reviyan ji bo jiyana xwe ya şêrîn biparêzin. Ajel pey wan ketin ta ew derxistin ji mêrgê û pihînan bi wan ketin ta ew ji deriyê zeviyê ve derxistin.

Serfiraz bun, lê westiyayî û birîndar bûn, xwîn ji wan diherikî. Pey re hêdîka vegeriyan bi aliyê zeviyê ve. Laşên hevalên wan ên mirî dihişt rondik ji çavên wan bibarin. Bi axîn û dilekî şikestî ber bi aliyê wî aşê ku niha nemaye çûn.

Dilên wan bi kul bû û axîn bi wan ket dema dîtin ku ew karê wan û aşê wan yê ku li vî cihî xwîya bû niha winda bûye, erê, hemî çû ta sînacê wî jî piçek jê nemabû. Ger vê carê disa ava bikin wê nekaribin keviran bidin hev. Kevir nemabûn, teqînê ew hûr û dûr kiribû, te digot qey ti car berî niha aş li vir nebû.

Dema nêzîkî xaniyên zeviyê bûn Squealer xwiya kir piştî ku di dema şer

de hemû nexuyabû. Dûvê xwe dibir û dianî û bi çavekî mezin li wan dimêzan. Piştre dengê guleyekê ji aliyê mala zewiyê ve hat. Boxer bang kir:

-“Ev gule ji bo çi bû?”

Squealer lê vegerand:

-“Ev şahiya serfiraziya me ye.”

Boxer got: “Çi serfirazî?” çokên wî birîndar bû û xwîn ji wan diherikî, simekî wî çûbû û gelek berên guleyan ketibûn piyên wî yê paş.

Squealer got:

-“Çi serfirazî heval! Ma qey me ne berda dijmin ji xaka xwe, ev xaka pîroz ya zeviya ajelan”.

Boxer bi dilekî bi kul lê vegerand:

-“Lêe aşê ba wêran kirin, me du salan kar kir di avakirina wî da.”

Squealer got:

-“Û çi pê ve heye! emê aşekî din ava bikin emê şeş aşên din ava bikin, eger em bixwazin. Lê tu xweş nizanî nirxê vî tiştê mezin ê ku me niha kir heval. Dijmin ev

axa em li ser, biribû, lê niha bi serkêşiya heval Naplyon me her bostek axa xwe vegerand.”

Boxer lê vegerand:

-“Nexwe me tiştên xwe yên berê vegerandin. Vêca serfirazî li ku ma?”

Squarel tuj li wî mêzand û got:

-“Ev e serfirazîya me!.”

Xwe berdane baxê zeviyê ew guleyên ku ketibûn bin çermê Boxer ew diêşandin. Lê di zanî ku kareki giran heye ji nû ve aşê ba ava bike. Di nerîna wî de ev erka wî bû. Lê hate bîra wî ku temenê wî 11 salî ye dibe ew laşê wî yê bi hêz û xurt nema weke berê be. Lê piştî ku ajelan ala kesk a ku bilind kiribûn li ezmanan dîtin û dîsa dengên guleyên şahiyê serkeftinê kirin ji wan re hate xwiya kirin ku serfiraziyeke geleki bilind kirine.

Ajelên di cengê de mirî rûresm û rêzgirtineke fermî ji wan re hate çêkirin. Boxer û Clower erbeya ku laşên wan li

ser bûn, dikişandin. Naplyon serkêşiya wan dikir û li pêşîya wan bi rê ve diçû.

Du rojan ji bo aheng û şahiyan kar rawestandin. Sitiran û tar hatin gotin, û dîsa gule berdidan û diyarîyek taybet, sêvek dane her ajalekî, ji ber ku sêv tiştê herî biha bû li ba wan. Kulmek genim ji bo her çûkekê û sê kulîçe ji bo her segekî. Hate ragihandin ku navê vî şerî wê bibe Cenga Aşê Ba.

****

Piştî demekî rojekê ji rojan berazan zembîlek wiskî dîtin li jêrxana mala zeviyê de. Xuya bû ew ji bîr kiribûn cara ku ger li zeviyê çêkiribûn. Di wê şevê de geleki dengê berazan ji odeyên zeviyê dihat. Dengê ken, sitran û awazan tev li sitrana Ajelên Englandê dikirin. Ajelên din lê hay diman, ji ber ku ti carî berî niha wilo çênebûbû. Demjimêr neh û niv bû, ji nişkê ve Naplyon ji deriyê pişt

derket, serxweş bû, kumê Johns li serê wî bû, bi lez li dora zeviyê bazda û disa vegeriya hundir.

Di roja pey re beyanî mala zeviyê bêdeng mabû. Beraz derneketin. Nêzî demjimêr 9ê Squealer xuyakir, hêdî hêdî û bi giranî bi rê ve diçû, çavên wî melûl bû, dûvê wî bi sistahî bi wî alehay bû, nexweşî tê re xuya bû. Bang li ajelan kir, ji wan re got: "agahiyek kambax û gelekî nexweş heye heval. Heval Naplyon li ber mirinê ye." Qîreke bi şewat û dilşikestî hat.

Ajelan hemî tişt amade kirin û pûş jî danîn ji bo dengê piyê wan dernekevin û liser kevîyen piyê xwe, çav bi hêstir diçûn û dihatin. Ji hev û du dipirsîn "gelo wê çi bi serê me were eger serokê me ji dest me here?"

Gotinek derket ku, piştî wê hemî guhdanê Snowball derfeta xwe dîtiye û jahr kiriye nav xwarina Naplyon.

Demjimêr bu 11, dîsa Squealer xuya kir ji bo ragihandineke din li ser zimanê Naplyon bide: “weke xwestina wî ya dawî ji pêdivîyên wî, heval Naplyon fermanek metirsîdar ragihandiye, her ajelekî vexwarinê serxweşkirinê vexwe siza wî serjêkirin e.”

Bi hatina êvarî re xuyakir go Naplyon ji berê çêtir e, û roja pey re Squealer karîbû bêje wan go rewşa Naplyon ber bi başiyê ve diçe. Di êvara wê rojê de Naplyon vegeriya karê xwe û di roja pey re Wymper şand bajar ji bo ku çend pirtûkan bikire li ser tirşkirin û dilopandinê.

Piştî heftiyekê Naplyon ferman da ji bo wî parçeyê biçûk yê dervî baxê yê ku berê, ajelên pîr yê nema dikarin kar bikin lê diçêriyan, divê were cotkirin ji ber çêrîgeh gelekî wêran bûye, gerek e dîsa were çandin û tovkirin. Lê zû hate xuyakirin ku Naplyon ceh li şûnê çand.

Di van deman de bûyerek sosret çêbû ku ajelekî nezanîbû çi ye. Ji ber ku di şevekê de dora demjimêr 12 dengê şikandineke bilind ji baxî hat. Ajel bi lez derketin, şev taveheyv bû, li dawiya axura mezin, li ber dîwarê ku her heft ferman li ser nivîsandîbû, pêlekanek şikestîbû û Squealer li ber dirêj bizdehay bûbû, çirayek, firçeyek û kutîkeke boyaxa spî nêzîkî wî bû.

Di cih de segan xwe xiste bara wî da were veşartin. Çawa Squealer rabû ser xwe ew vegerandin mala zeviyê. Ajeleki nedizanî çi çêbûye û kêşe çi ye. Tenê Benjamin ê pîr hilmek kişand weke ku di kêşeyê gihişt û bûyer naskir, lê neaxifî.

Piştî çend rojan Moril ji xwe re her heft ferman dixwendin. Têgihişt ku ajelan fermanek din ji wan şaş ezber kiribû. Ji ber wan digot, fermana pêncan dibêje nabe ajel vexwarinê serxweşkirinê vexwin. Lê va ye nivîsandiye ku nabe –

ajel - vexwarinên serxweşkirinê - vexwin - bi pirranî.

## BEŞA 9

Demê dirêj borî ta simên Boxer ê derizî baş bû. Roja piştî ahengên serfiraziyê careke din dest bi avakirina aşê ba kir, ji ber ku Boxer li xwe nedianî ku rojekê kar rawestîne. Jê re ne rûmet bû ku êşa wî were bihîstin yan jî zanîn. Êvarî, di nav xwe û Clower de got ku ew simê wî pir astengiya jê re çêdike. Clower simê wî jê re girêda bi hinek giyayên qayim. Clower û Benjamin bi Boxer de xeyidîn, ji bo ku karê xwe kêm bike û nema weke berê xwe biwestîne. Clower gote wî: "pişikên hespan herûher weke xwe namînin."

Boxer guh nedida wan, û peyvên wan ne dixiste serê xwe, digot: "..ehh, kula min tenê ewe ku ez aşê ba avakirî û li kar bivînim berî ez bivim karnekar."

Despêkê de dema zagon û yasayên zeviya ajelan hate danîn temenê karnekariya ajelan jî dane xuyakirin: Ji bo hespan û berazan 12 sal, ji bo çêlekan 14 sal, ji bo segan 9 sal, ji bo pezan 7 sal û ji bo mirîşk û qazan 5 sal. Her wiha para xaneşînê jî hate danîn. Lê belê di wê dawiyê ser vê mijarê de gelek guftugo kirin. Niha piştî ew perçeyê xakê yê li derveyî baxçe bû ji bo ceh, dihate gotin ku wê goşeyekê ji mêrga mezin bikin ya ajelên pîr, û yên ku nema dikarin kar bikin. Ji bo para hespan ji xwarinê dihate gotin wê her rojêke bi buhaiyê pênc paûnan genim bidin wan û di zivistanan da buhayiya 15 paûnda ka û di pişûyên giştî gêzerek yan lewaneye sêvek û di vê mijara pişûyan de vaye rojbûna Naplyon ya 12yan nêzîk bûye.

Di ser astengiyê jiyanê de ev zivistan weke zivistana çûyî pir sar bû. Êm kêmtir bû. Careke din para xwarinê kêm kirin, tenê ya berazan û segan weke xwe ma. Weke ku ajelan didît kêmkirina êm li dijî ajalayetiye ye. Lê Squealer pê ne giran bû ku ji wan re şirove bikê go ev kêmkrina di êm de ne kêmkirin e, weke tê xuyakirin, ji ber ku di vê demê de pêwist e para êm were sererastkirin. Squealer tim digot sererastkirin, ti carî peyva kêmkirin ne dianî ser zimanê xwe. Rojên dema Johns û dema niha dida ne ber hev. Dida xuyakirin ku niha gellekî pêşketî û baştir bûne û ji wan re bi dengeki tûj û bi lez ji çend kaxezên fermî dixwend, niha êm bêtir bûye û ka bêhtir heye, ji dema Johns û niha dema kar kêmtir e. Ava vexwarinê pakijtir e û ji bo wilo temenê wan dirêjtir dibe. Her wiha rewşek baştir e ji bo çelikên wan, pûş jî bêhtir e di axur û govên wan de, û nema weke berê nesax dikevin.

Ajelan ev peyv hemî bawer dikirin, ew rojên Johns xweşik nedihate bîra wan tenê zanîbûn ku rojên aniha pir nexweşin û bi astengî diborînin, gelek caran birçî dibûn û serma digirtin û bêhtir kar dikirin, ji dema ji xew dirabûn heta ku radizan. Ji xwe re digotin, xuya ye rojên berê nebaştir bû, gelek şa dibûn bi va baweriyana.

Ji bili van hemû tiştan di dema Johns de bindestî bûn, lê niha azad bûn û ev e tiştê ku her du deman ji hev cuda dike. Squealer zanîbû xweşik ji wan re rawe bike: Niha gelek dev hebûn ku bê ne êmkirin. Di payîzê de her çar mehû zaan, û 31 kudik anîn, hemû jî rengîn bûn. Ji ber Napolyon tenê nêr bû di zeviyê de, xweş dihate zanîn ew bavê wan e.

Piştî kêlekê hate ragihandin wê kerpîç û beştan bikirin ji bo ku dibistaneke biçûk ava bikin di baxê zeviyê de, bi taybet ji bo çêlîkên Naplyon. Piştî avakirinê wê Naplyon waneyên wan ji

wan re bêje. Lê ta were avakirin wê çêlik waneyên xwe di odeyeke zeviyê de bistînin, wê xwe rahênan bikin di baxê zeviyê de. Lê ew tirsandin go bi çêlikên ajelên din re nelîzin her wiha ferman hatibû ragihandin eger ti beraz di çi riyê de here û ajeleki dî di riya wî de derkeve ew ajelê dî divê li aliyekî raweste ta ew beraz jê derbas bive. Her wiha hemî beraz û ji hemî pileyan ji wan re derdikeve weke mezinkirinekê ji wan re ku rîbandek e kesk rojên yekşeman bi dûvên xwe vekin.

****

Salek, bi serkeftin borî, lê pereyê wan ne gelek bûn. Pêwîst bû kelpîça, qûm û kilsê bikirrin ji bo avakirina dibistana çêlîkên berazan, û pêwîst bû peran bidin hev ji bo mekîneyên aşê ba. Û her wiha kirosîna çireyê û mûman ji bo mala zeviyê, û şekir ji bo xwarina Naplyon. Lê şekir qedexe kiribû ji bo berazên din re, digot wan qelew dike. Her wiha pêwîstiyê

din weke alavan, bizmar, mer, têl, hesin û kulîçe ji bo segan. Bênderek ka û beşek ji patatan hate firotin û ew li hevkirina hêkan kirin 600 hêk di heftiyê de, ta ku mirîşkan wê salê hejmara çêlîkên xwe hiştin weke berê. Êm jî hîna bêhtir hate kêmkirin; di meha Berfanbarê da û di meha Sibatê da dîsa hate kêmkirin. Lempa hatibû qedexekirin di axura da, ji bo ku neftê pir xerc nekin. Lê ev rewş li ser berazan normal bû, ne tenê wilo jî, her bi her qelewtir dibûn.

****

Rojeke germ ji meha Sibatê di dahnê êvarê de bêhnek e tûj hate ji xaniyê tirşkirinê yê ji dema Johns de beradayî bû, di ber cêjtxanê de bû. Ajelan berî niha ti carî ev bêhn seh nekiribûn. Hinekan digot ev bêhna xwarinê ye, ajel birçî bûn û av bi devê wan ket; ji hev dipirsîn: “gelo ev xwarin ji bo me ye?” Lê mixabin ti xwarin ji wan re nehat.

Yekşema pey ra hate ragihandin ku ji niha û pê de hemû ceh wê here ji berazan ra. Her wiha ceh hate çandin li xaka pişt baxê û agahî belav bûn ku rojane wê her berazekî parekê ji bîrayê ji xwe re werbigire. Para Naplyon jî niv galon bû û jê re dixistin piyalan[12]. Her carekê ajelan astengiyek yan pirsgirêkek dîtiban yan westiyabana dilê xwe xweş dikirin, digotin em niha azadin û bi rûmetin, ne weke dema Johns e. Niha sitran, axaftin û her wiha aheng û şahî hene.

Ji layê xwe ve Naplyon ragihandibû ku her heftî carekê divê xwepêşandaneke tevahî ji ber xwe ve çêbibe. Mijara van xwepêşandanan ji bo rêkeftin û serkeftin û tekoşînên Zeviya Ajelan bû. Dema ku ev xwepêşandan destpê-kiribûna pêwîst bû ajel karê xwe bihêlin û bi awayekî leşkerî herin bi aliyê wê de. Berazan serkêşiya wan dikirin, piştre hesp dihatin. Çêlek, pez, ê dî mirîşk û seg li

[12] piyale=qedeh

dora wan bûn. Li pêşiya hemîyan keleşêr ê reş yê Naplyon bû. Her car Boxer û Clower di orta xwe de radihiştin paçikekî kesk ku li ser nivîsandibû 'Bijî Heval Naplyon' û her wiha simek û sitrehek xêzkirî bû li ser wê paçikê. Bi çend helbestan ser Naplyon dest pê dikirin, piştre Squealer gotarek dida û diaxifî li ser pirbûna êm û berhemên zad. Di helkeftinan de guleyek dihate berdan. Pez bêhtir beşdar bûn ji ajelên din û karîger bûn, eger ajelekî gazin kiribûna dema seg yan beraz ne li wir bûna li ser ku dema xwe winda dikin û geleki di sermayê de dimînin pezî yekser ew radiwestandin û bêdeng dikirin bi awaza xwe ya hercar; 'çar lingî başin du lingî nebaşin'.

Piraniya ajelan dilxweş bûn bi van ahengan, ji ber ku her car dihate bîra wan ew bi xwe xwediyê vê zeviyê ne û ne di bin destê kesî de ne, û her tiştekî ku dikin ji bo berjewendiya wan e. Bi sitran,

helbestan û listeyên Squealer yên ku li ser pêşketinê bûn bi teqandina guleyan û dengê keleşêr, her wiha bi hildana alê ajel ji bîr dikirin ku birçî ne û hûrên wan vala ne. Eger ji binî ji bîr nekiribana tenê wê kêlîkê ji bîr dikirin.

****

Di meha Nisanê de Zeviya Ajelan kirin komar û pêwîst bû serokkomerekî hilbijêrin. Berbijerekî tenê hebû; ew jî Naplyon bû, yê ku bi tevahî hatibû hilbijartin. Di wê rojê bi xwe da dokumentên nû hatin xuyakirin. Wirdkariyên nû derketin li ser hevkariya Snowball bi Johns re. Niha xuyakir ku ne wek ajelan guman dikir ku Snowball dixwest cenga gova çêlakan têk bive. Lê rastî ne wilo bû. Snowball bi xwe li aliyê Johns bû û wî bi xwe serkêşiya wan dikir di şer de, û di nav şerê xwe de bang dikir "bijî mirovatî", û ew birînên di pişta wî de, weke tê bîra hinek ji ajelan, ew bi xwe şûna diranên Naplyon bû.

****

Piştî çend salan nîva havînê qijikê bi navê Moses careke din xuya bû. Ti guhertin lê dîyar nebû, hîna ti kar nedikir û li ser wê mijara xwe ya hercar, li ser Çiyayê Şekiran diaxifî. Li ser qurmê darekî rûdinişt û baskên xwe yên reş vedikirin û çend demjimêran diaxifî. Li ezmanan dimeyzand û ji her yekî ku guhê xwe dida ne wê ra digot:

-"Li jor heval, li jor, pişt wan ewrên mezin, ên ku hûn dibînin, li wir e, çiyayê şekiran, welatê herî xweş û dilşad, ji me ajelan re, em ajelên hejar, emê lê bijîn û ji vî karê giran rizgar bibin û nema kar bikin." Her wiha digot, ew bi xwe jî çûye wî welatî. Carekê ji wa caran ku pir bilind firî bi çavên xwe dîtibû: Mêrgên fireh yên şekir û darên kêk û şîranîyê ku li derdorê şîn dibûn. Gelek ajelan ev yek bawer dikirin.

Ji xwe re dikirin sedem ku piştî evqas karî û westaybûnê û birçîbûnê pêwiste

jîyanek e xweştir li cihekî din hebe. Lê tiştê ku bêhtir ew gêj dikirin nerîna berazan li ser gotinên Moses bûn. Hemiyan bi tevahî ragihand go tiştên ku ew dibêjin derew in û tiştek nîne bi navê çiyayê şekiran. Lê wilo jî berazan dihişt Moses li zeviyê bimîne, ti kar jî nedikir, her wiha her roj parek ji bîrayê jî didanê.

Piştî simên Boxer sax bû kar bêhtir ji berê dikir. Bi rastî wê salê hemû ajelan weke koleyan kar dikirin. Li gel karê rojane li zeviyê û duyemîn car avakirina aşê ba, her wiha avakirina dibistanê ji bo çêlikên berazan ya ku di Adarê de dest pê kiribû. Carinan bi demjimêrên dirêj bê êm û bi gelek astengî dibûrandin. Belam Boxer ti car gazin nedikirin, ti car li xwe nedida xuyakirin ku hêza wî kêmtir bûye ji berê, tenê di rûyê wî de hinek guhertin çêbûbûn, rûye wî ne weke berê vekirî bû, qermîçok ketibûn qirika wî ya girs. Hineka ji ajelan got wê di biharê de Boxer bikeve. Lê gîhayê biharê şîn bû Boxer li

ser xwe ma. Hinek caran çaxa ji newalê hildikişiya û berê xwe dida jor bi hêza xwe kevirên giran û mezin digerandin di pêş de. Xuya bû ku tiştek wî bi awayekî xurt li ser lingan nahêle ji bilî vîn û daxwaziya wî ya ji bo berdewamiyê. Carîna digihîşt astekê, nema deng jê derdiket, lê levên wî digotin 'ez ê xurttir kar bikim' disa Clower û Benjamin ew agehdar dikirin ji bo ku hişyar be li ser tenderustiya xwe. Lê Boxer guh nedida wan.

Duwazdehemîn rojbûna wî nêzîk dibû lê wî guh nedida tiştekî ji bo ku karîbe kevira bikêşîne berî ku ji kar bikeve. Dawiya êvarekê havînî gotinek di zeviyê de belav bû go tiştek bi Boxer hatiye. Ew bi tena xwe daketibû newalê ji bo kevira hilkişîne ji aş re. Ew gotina belav bûyî rast bû. Piştî bîstekê du kevok bi lez ji aliyê newalê ve agahî hatin gotin: "Boxer li ser aliyekî xwe ketiye û nikare rabe!" Nîvên ajelan bazdan bi aliyê newalê ve,

dîtin ku Boxer dirêjkiri ye, di nîva her du mişanan de. Qirika wî vezîlîha ye û nekarîbû serê xwe hilde, bi çavê xwe li dûr dimeyzand, piyên wî sist bûbû û xwêdan dabû. Terîşkek zirav ji xwîne ji devê wî herikî bû. Clower xwe avêt ser çokên xwe li ber wî û bang kir:

-"Tu çawa ye Boxer". Boxer bi dengekî sist got:

-"Ez dibêjim cegera min e, xem nîne Clower, guman dikim ku tê karibe aşê ba pêk bîne bêyî min, me gelek kevir dane hev ji xwe heyveke tenê ji min re mabû. Clower ez ê bi rastî ji te re bêjim, ev demek e ez li bende karkenara xwe bûm, û va Benjamin jî pîr dibe, le waneye bihêle ku ew jî dest ji kar bikişîne bi min re, û em bi hev re bimînin." Clower got:

-"Dibê hinek werin alî me, herin ji Squearel re bêjin çi çêbûye!" Hemû ajel yekser bazdan bi aliyê mala zevîyê re ji bo ku alîkariyê bînin, tenê Clower ma û Benjamin jî li rex Boxer bû. Nediaxifî lê

bi duvên xwe berdidan mêşan ji ser Boxer.

Piştî çaryekekê ji demjimêrê Squealer xuyakir, tijî dilovanî û xemgînî bû, got:

-“Heval Naplyon bi dilekî bi kul ev agahî kambax li ser dilsoztirîn karker li zeviyê bihîstiye, û amadekariyê dike ji bo Boxer bişîne nexweşxaneya li Bajar.”

Ev tişt bi ajelan nexweş bû. Ji ber ku ji bilî Mollî û Snowball ti ajelên din derneketibûn derveyî zeviyê û ta nedixwestin hizir jî bikin ku hevalên wan ê nexweş wê bikevin nav destên mirovan. Lê Squealer bi hêsanî xiste serê wan go bijîjkê ajelan li bajar dikarin rewşa Boxer çareser bikin, gelekî çêtir e ku li zeviyê bimîne. Piştî nêzîkî niv demjimêrê Boxer hinekî hate ser xwe, bi kotekî rabû ser lingan û bi giranî vegeriya axura xwe. Li wir Clower û Benjamin cihêkî xweş ji pûş jê re çêkiribû.

Du rojan Boxer li axura xwe ma, berazan şûşeyeke mezin ji dermanekî

penbeyî di nav dermanên li mala zeviyê de dîtin û şandin ji wî re. Clower rojê du caran didayê piştî êmê xwe dixwar, êvaran li axura wî xwe dirêj dikir û bi wî re diaxifî. Her wiha Benjamin jî mêş dûrî wî dikirin. Boxer ne poşman bû li ser tiştê çêbûyî. Eger sax biba dibe ku sê salên din jî bimîne û li benda wan rojên xweş bû ku wê li qurçikên mêrgê here û were. Her wiha wê karibe xwe fêrî xwendinê bike û mejiyê xwe pêş ve bixe. Xistibû serê xwe ku her du salên mayî ji jiyana xwe, xwe fêrî tîpên elfebeyê bike. Clower û Benjamin dilşikestî bûn ku nekarîbûn bi Boxer re rûne, tenê pê re rûdiniştin piştî ku karê xwe bi dawî dikirin.

Nivro bû ajelan hemîyan kar dikir di baxçe de, di bin çavdêriya berazan de tov diçandin. Erebeyek hat ji bo ku Boxer bive. Ajel bazdan gava dîtin ku Benjamin bi lez û bez dihat ji aliyê mala zeviyê ve, bi dengekî bilind dizirî. Ev cara pêşî bû ku ajelan Benjamin wilo germ didîtin. Bi

rastî ev cara yekê bû ku ew didîtin bazdide. Benjamin qîrek da “bi lezz! bi lez zû werin wê Boxer dûr bikin!” ajelan karên xwe rawestandin bêyî ku li benda biryara wî berazî û bi lez ber bi mala zeviyê ve çûn. Gotina Benjamin rast bû; erebeyek mezin ser girtî li hewşa zeviyê bû, du hesp di ber de bû zilamek jî xuya dikir, kumek li serê wî bû li cihê ajovan rûniştî bû. Axura Boxer vala bû, ajelan hemîyan xwe da dora erebê û gotin “oxir be Boxer, oxir be!”

Benjamin qîrek da û got: “Bêhişno! Bêhişno!” li hawîra wan baz dida û lingê xwe li axe dixistin, “bêhişno ma hûn nabînin çi li ser rexê erebê nivîsandiye?” Li vir ajel hemî rawestiyan, û ma ne bêdeng, Moril dest bi xwendina tîpan kir, lê Benjamin ew bi wê de bir, bi bê dengî çavên ajelan man li ser Benjamin. Benjamin xwend: “Alfred Simmonds Ji bo Serjêkirina Hespan û Çêkirina Demûjekan li Bajarê Willingdon Serkarê

Firotina Goşt û Hestîyan û Guhandina Birhan, ma hûn nizanin wateya vê çi ye? Wê Boxer bibin cem serjêker!”

Qîra tirsê bi ajelan ket. Di vê kêlîkê de zilam qamçî li hespên xwe xist û bi jîrbûn ji hewşa zeviyê derket. Ajelan hemîyan da pey û bi dengekî gelekî bilind kirin qîr bang kirin. Clower bi xurtbûna xwe da pêşiya wan, lê erebe bi leztir diçû, lê Clower xwe gihand û bang kir: “Boxer! Boxer! Boxer!” Boxer denge wê kir û giranî serê xwe hilda û xuya kir ji penecereyeke biçûk ku di dawiya erebêyê de bû. Clower bi dengekî tirsedar got: “Boxer! Derkeve, zû derkeve, wê te bibin serjêkirinê!” Ajelan teva weke wî vegerandin û gotin “derkeve Boxer derkeve!”

Lê erebe bi lez dûr ketibû û ne hate xuyakirin Boxer têgihişt ku Clower çi got yan na. Piştre nema serê wî xuyakir lê dengê pehîna hat ji hundir erebeyê. Xuyabû ku Boxer dixwest derkeve. Boxer

karîbû bi çend pehîna derî bişkîne, lê mixabin hêza wî niha nemabû weke berê. Piştre dengê pihînan hêdî hêdî kêm bû, pişt re nema.

Ajel ma ne bêhêvî xwe nêzîiki wan her du hespên erebeyê kirin, û bang kirin wan: “hevalno hevalno! birayê xwe nebin serjêkirine!” lê her du ajelên gêj û nezan guh neda tiştekî, berê xwe nedane wan û bi rê ketin. Serê Boxer nema ji pencereyê xuyakir. Hinek ajelan hizirkirin herin bi lez herin û deriyê zeviyê asê bikin, lê pir derneg bû ji ber ku erebe nêzîkî derî bûbû û kete ser rê, nema careke din Boxer dîtin.

****

Piştî sê rojan hate ragihandin ku Boxer mir li nexweşxaneyê, tevlî geleki bi guhdan bû, hemî tişt ji wî re hate kirin. Squealer hat ji bo agahiyan bigihîne wan,

ji wan re got, go di dema wî ya dawî de ew li wir amade bû. Di ber axaftinên xwe de giriyê xwe dianî û digot:

-"Dîmenek herî bi bandor û dilêş bû ku min di jiyana xwe de dîtibû, ez li balê bûm ta ku mir û di dawiyê de bi dengekî lawaz gote min, ma kulek di dilê wî de wê bimre berî ku bibîne aşê ba kar dikê, gotinên wî yê dawî herin e pêş hevalno herin e pêş, di bin navê raperînê de, her bijî zeviya ajelan, bijî heval Naplyon, Naplyon tim rast e."

Piştî bêdengiyekê Squealer hate guhertin û bi çavên gumaniyê li wan nihêrî û bi axaftina xwe ve çû, û got: "e,e, ber guhê min ketiyê ku gotinên telawela û ne di cih de belav bûne li ser derxistina Boxer. Hinek ji ajelan dîtine ku li ser wê erebeya ku Boxer bir, nivisandîbû serjêkirina hespan, her wiha wan ajelan gotibû Boxer hatiya şandin ji serjêker ra. Ez bawer nakim ku ajelên wilo hov û gêj hene". Dengê xwe hilda û weke her car

xwe ji alîkî bir aliyekî dî û dûvê xwe rakir û pê de çû û got: “Bê guman hûn serokê xwe Naplyon çêtir nasdikin, ravekirina vî tiştî pir hêsan e. Ji ber ku ev erebe berê ya yekî serjêker bû û bijîşkê ajelan ji wî kirrî bû, lê hîna navê berê li ser bû. Şaştî, hemî ji vê yekê çêbûye.”

Dilê ajelan hate xweşkirin û dema Squealer bêhtir axifî li ser kêlîkên Boxer yên dawî, ku çawa li cem bijîşk bi guhdan bû û dermanên herî biha didanê û ti carî Naplyon guh neda buhabûna dermana û nirxê wan. Xemgînî dilşîna wan li ser mirina hevalê wan kêmtir bû ji ber vê guhdanê. Çimkî hevalê wan dilxweş mir.

Naplyon bi xwe jî hate civîna yekşema piştî wê û peyveke kurt da ji bo rêzlênan û rûmetgirtin ji Boxer re. Gote ajelan ku derfet nebû laşê hevalên xwe bînin ji bo ku li zeviye bi cih bikin, lê gote wan divê gulbendeke mezin ji gulîstana zeviyê çêkin û bişînin ser gorra wî. Û wê beraz piştî çend rojan ceşneyekê li ser canê

Boxer çêkin Naplyon di dawiya gotina xwe de her du peyvên ku hercar Boxer digotin “ez ê xurttir kar bikim û heval Naplyon tim rast e.” Biryar da ku divê ajel hemî van peyvan bikin yên xwe û bikarbînin weke wî.

Di roja ku wê beraz ceşneyê çêkin de erbeyek ji aliyê bajar ve hat sendoqek deppî anî û xistin mala zeviyê. Di wê şevê de dengê kenê bilind û sitranan gelek dihat û pey re dengê pevçûneke giran hat û dora demjimêr 11 bi dawî hat, piştî dengekî bilind şikandina ji şûşeyekê hat. Roja din heta nivro deng ji mala zeviyê derneket. Peyvek derketibû ku berazan pere ji derekê anîne û sendoqeke din ji wîskî ji xwe re kirrîne.

## BEŞA 10

Salan da pey hev. Werz hatin û çûn. Jiyana ajelan ya kin bilez diçû, û rojek hat demên berî raperînê nema hate bîra ajelekî, ji bilî Clower, Benjamin, Moses û çend berazan pê va. Morill miribû, Loubel, Jessi, Pincel miribû, Johns jî miribû, bi sermestbûnê di mala xwe de ya ku li aliyê din yê bajar bû. Snowball hatibû jibîrkirin, Boxer jî hatibû jibîrkirin lê ji bilî yên ew ji nêzî de nasdikirin. Clower niha bûbû mehîneke pîr, çokên wê hişk bûbû, çavê wê sist bûbû, ev du sal bû derbasî temenê karkenarê bûbû. Lê bi rastî ajelekî tenê jî jiyana karkenariyê nedît. Ew axaftinê

li ser ka wê ajelên pîr li hawîrê zeviyê ji xwe re bê ku karbikin rûnin, ew axaftin û yase hemî hatibûn hilanîn

Naplyon niha nêrberazekî gihiştî û di kîmkîma xwe de bû. Squealer gelekî qelew bûbû, nema xweş didît ji ber çavê wî di nav goşt de winda bûbû. Lê tenê Benjamin gişt wek xwe mabû. Hinekî rengê lêvên wî hatibû guhertin û ji çaxê ku Boxer miribû bêhntengtir bûbû û bêhn tirştir bûbû. Her wiha axaftinên wî ji berê kêmtir bûbû.

Niha afirînde li zeviyê pirttir e. Tevî ku ev pir bûn ne li gor hêvî û bawerîya wan bû, salên borî da. Gelek ajel çêbûbûn tiştek li ser raperîne nizanîbû ji bilî ku tiştên ji devan bihîstîbûn. Hinek ji ajelan navê raperînê jî nebihîstîbûn berî bigihin zeviya ajelan. Niha li zeviyê sê hespên din ji bilî Clower xwedî dikirin. Girs bûn û li ser xwe bûn û karkerên kêrhatî hevalên qenc bûn lê gelekî gêj bûn. Yekî ji wan nekarîbû fêr bibe ji bilî tîpa B, û

her tiştên ku ji wan re hatibû gotin li ser raperînê, bawer kiribûn, bi taybetî ji devê Clower. Ji ber ku cihê Clower li cem wan gelekî bilind bû. Lê xweş nexuyabû ka bi rastî bi van gotinan de gihiştibûn yan na.

Wymper jî erebeyeke biçûk ji xwe re kirrîbû. Zevî niha baştir serkeftî bû, û bi rêxistin bû, bêhtir sazkirî bû û her wiha zevî firehtir bûbû piştî du parçeyên erd ji Pilkington kirrîbûn.

Li dawîyê de avakirina aş bi serkeftin pêk hatibû. Û bûbûn xwedî mekîneyeke çinînê û mekîneyeke çêkirina kayê. Her wiha gelek xanîyên din avakiribûn. Mixabin aş nehate bikaranîn ji bo dana elektirîkê û ronîkirina zeviyê. Lê belê bikarhat ji bo hûrkirina genim û pere baş jê dihatin piştî pêkanîna avakirina aşê yekem û anîna dinemoya jê ra. Ji ajelan hate xwestin ku karekî behtir bikin ji bo avakirina aşekî din. Lê mixabin ne weke ku ji ajelan re hatibû gotin bi devê Snowball, ku wê elektrik di hemû axuran

de peyda bibe, û ava sar û germ û sê rojên bişû di heftiyê da. Nema ev tişt dihatin gotin. Naplyon got ku ev tişt li dijî çalakiya ajaleyetiyê ne û gote wan dilxweşiya bi rastî di karê gelek de ye û di jiyana sirûştî de ye.

Bi vî awayî roj bi roj zevî dewlemendtir dibû, bê ku ajel bi xwe dewlemend bibin, ji xwe ji bilî berazan û segan. Dibe ku ji ber beraz û seg gelek hebûn li zevîyê û te digot qey ti karî nakin lê belê didane xuyakirin ku gelek karan dikin. Weke mînak Squealer yê ku her roj diwestiya ji axaftinê û ji şirovekirinê, her wiha zerevanî û diristkirina kar li zeviyê, wek van karan ti car ajel tênedigiştin. Nimûne Squealer ji ajelan re digot ku her roj beraz pir kar dikin li ser tiştna bi navê *testbend*, *rapor*, *lêkolîn* û *protoqol*. Kaxezên mezin hebûn ev tişt li ser wan dinivîsandin. Piştî kaxez dihatin dagirtin bi nivîsandinê, dişewitandin di nav agir de. "Ev girîngtirîn kar e di zeviyê de ye"

Squealer digot, lê ti êm û hatin ji karê seg û berazan dernediket. Û di ser de jî her tim dilê wan ji xwarinê re vekirî bû, û çavbirçî bûn. Ji ajelên din re jiyan her weke xwe dima. Bi birçîbûn û xewa ser pûş û vexwarina avê ji golan û her û her kar dikirin çi çandinî çi çinîn.

Havînan mêşan digirte wan, zivistanan serma ew digirtin. Carina ajelên pîr rojên berê dianîn bîra xwe dema raperîn hîna nû bû û Johns nû çûbû. Ji xwe dipirsîn gelo hingî rewş xweştir bû yan xerabtir bû ji niha. Nema zanîbûn çi bidine ber hev, ji ber ku tiştek nedihate bîra wan, tenê tiştê ew vegerandine berê lîsteyên Squealer bû, yê ku herdem jiyana berê û niha didane ber hev, û digot bi giştî rewş çêtir dibe.

Ajelan didîtin ku kêşe û kêmanî namînin piştî axaftinên Squealer. Hemû tişt bawer dikirin ji ber ku bi rastî dema wan nebû ku hizir bikin û ramanan bikin, ser van mijaran. Tenê Benjamîn

bû yê ku her tişteki biçûk û mezin her bîranînek di jiyana wî ya dirêj de dihate ber çavên wî û zanîbû ku jiyan nexweştir dibe û nenexweştir dibe, jiyan her wek xwe dimîne. Çi bi birçîbûnê û çi bi astengiyê û dilsarîyê. Ev e yasa rewşa ku nayê guhertin di jiyanê de. Lê wilo jî ajelan hêvîya xwe wenda nekirin û dest jê nediberdan her serbilind bûn ku ji endamên Zeviya Ajelan e. Ji ber ku ew zeviya tenê bû li bajêr û seranserê Englandê ku rêrveberîya wê di destê ajelan de bû. Yekî ji wan çi biçûk çi jî yê ku ji derveyî zeviyê hate kirin nekarîbûn dilxweş bin ne bi vê yekê. Her careke ku dengê guleyan dikirin ala xwe ya kesk bilind didîtin dilgeş dibûn xwe serbilind didîtin. Gelek diaxifîn di ser qehremaniya rojên borî.

Xewnê xwe yên berê neberdan. Komara ku Major li ser axifî bû dema ku got; çênabe lingê mirovan were ser xaka Englandê ya kesk. Bawer bûn ku wê

rojek were ew xewn bi cih bê, dibe ku ne nêzîk be yan ji ne di jiyana wan de be lê her wê pêk bê, ta carîna sitrana ajelên Englandê bi dizî himhim dikirin. Bi çi awayî be divê ku her ajelek di zeviyê de vê awazê zanibe. Di ser ku yek ajelek newêrîbû eşkere û bi dengekî bilind bibêje. Raste ku hemî hêvîyê wan bi cih hatine lê bêguman rewşa wan çêtir bû ji rewşa ajelên zevîyên din. Heke ku birçîbûna jî, ne ji kêmbûna xwarinê ji bin destê mirovekî sitemkar û zordar re. Eger karê wan giran bû na jî ji kêmanî kar ji bo wan bû. Yek ji wan ne du lingî bû. Kes nebû ji wî re bêjin hosta. Hemî ajel weke hev bûn.

****

Rojeke havîne Squealer bang kire pezan û ew birin mêrgeke dûr li dawiya zeviyê. Giya pir bilind bû li wir. Pez wê rojê giş di nav giya de man di bin çavdêrîya Squealer da. Êwarî ferman da pezan ku li wir bimînin, ji ber germê, û bi

tena xwe vegeriya mala zeviyê. Heftiyekê pez li wir man. Di vê navê de pez xwiya nedikirin. Bi roj pê de Squealer bi wan re dima û digote ajelan ku pezan fêrî sitraneke nû dike û gellekî pêwist e bimîne veşartî.

Di êvarekê de pez vedigeriyan û ajelan jî karê xwe bi dawî kiribûn û vedigeriyan. Ji nişkê ve qîreke bilind û bi tirs hat ji hespekê, li hewşa zeviyê. Ajel hemî rawestiyan. Dengê Clower bû. Ajelan hemîyan bazdan bi aliyê wê de. Careke din hîrhîreke bilind kir. Ajel gîhan ser û ma çi bivînin! berazek li ser herdu lingên xwe yê paş bi rê ve diçû. Belê, Squealer bû, û hinekî bi astengî bi rê ve diçû û nezanîbû xweşik xwe bi xwe bigirta lê bi hevsengiyeke baş bi rê ve diçû. Li dora hewşê digeriya. Pey re bîskekê çend berazên din derketin ji deriyê mala zeviyê. Hemî li ser lingên xwe yên paş bi rê ve diçûn. Hinekan xweştir ji hinekên din dikirin yek du ji wan xwe li xwe

nedigirtin, diyar e ku pêwist bû xwe berdina ser darekî. Lê hemû bi serkeftin li dora hewşê geriyan. Di dawiyê de dengê reyandinên bilind piştre dengê keleşêr jî hat û Naplyon bi rûyekî tirş derket û çavsorî li vî alî û wî alî nihêrî. Segên wî li dora wî bûn û qamçîyek di destê wî de bû.

Di vê kêliyê de bêdengiyeke pir bi tirs hebû. Bi matmayî bûn û çavbitirs temaşe dikirin li wan berazên ku rêz bûbûn li pey hev. Beraz hêdî hêdî birêve diçûn û digeriyan. Ajelan te digot qey cîhan ser û binê hev bûye. Bi vê dîtinê lewaneye ku hinek ji ajelan axifîban li dijî vî tiştî ne di rê de. Tevî tirsa wan ji segan û tevî ku ev çend salin li dijî berazan re nerabûne di ser birçîbûn û karê giran re mixabin derfet ji wan re çê nebû. Çimkî di vê kêlîyê de pezan hemîyan bi hev re bang kirin "çar lingî başin du lingî baştirin, çar lingî başin du lingî baştirin, çar lingî başin du lingî baştirin". Nêzî pênc

xuleyan li ser hev gotin piştî rawestiyan ajelên ku dixwestin biaxifin li dijî vê birêveçûnê nema axifî û beraz hemî vegeriyane mala zeviyê.

Tiştek li milê Benjamin ket, li dora xwe niherî Clower bû, çavên wê pir kûrtir bûbû ji berê. Berî ku tiştekî bêje berê wî da axura mezin, cihe her heft fermanan. Kêliyekê rawestiyan û li dîwar li wê boyaxa spî nihêrîn. Clower got: “a,ax, çavê min arî min nakin, dema ez biçûktir jî bûm min nezanî bixwînim. Lê xuyaye dîwar hatiye guhertin. Ma her heft ferman heman yê berê ne Benjamin?” Ev cara pêşî bû Benjamin zagona xwe dişikand û ji Clower re xwend. Lê niha tiştek li ser dîwar nebû, ji fermaneke tenê pê ve. Ew jî ev bû: “Hemû ajel weke hev in lê hinek ajel hene wekheviya wan bêhtir e ji yên din”.

Roja piştî vê bûyerê tiştekî normal bû ku hemî berazên di çavdêriyê de kar dikin, her yek ji wan qamçîyek pê re be.

Her wiha dema ku bibihîsin berazan ji xwe re telefon anîne ew jî tiştekî normal e û lewra ajel matmayî neman dema dîtin Naplyon xuyadikir di zeviyê û qelûn di devê wî de. Her wiha dema dîtin ku berazan cil ji xwe re derxistine ji odeya Johns û li xwe kirine, ta Naplyon jî qapûtekî reş û şelwarekî çermî li ber xwe kiribû. Her wiha wê beraza mê ya ku Naplyon jê bêtir hezdikir, cilê jina Johns li ber xwe dikir, rojên yekşeman.

****

Piştî heftiyekê, nav rojê hejmarek erebeyan ber zeviyê ve hatin. Komîteke çavdêrîyê bû ji xwediyê zeviyên derdorê, hatibûn ji bo ku bigerin li zeviyê. Li zeviyê hemû geriyan û temaşeyî wê kirin û gelekî dilxweş bûn bi hemî tiştên ku dîtin, bi taybet aşê ba.

Ajelan tovê şêliman diçandin serên xwe xistibûn ber xwe de, û nezanîbûn gelo ji mirovên mêvan bitirisin yan ji berazan. Wê êvarê de dengê kenê bilind û sitranan

ji mala zeviyê dihat. Bu meraq ji ajelan re bizanibin çi çêdibe. Ev cara pêşî bû ku beraz û mirov digihîştin hev di bin yek banî de û dibûn weke hev. Êdî bi dizî û hêdîka ber bi mala zeviyê de çûn li ber deriyê gulîstana mala zeviyê rawestiyan. Ditirsiyan derbas bibin. Wêca li ser keviyê lingê xwe çûne hundir û yên dirêj xwe ditewandin, û bi vî awayî xwe gihandin ber pencereya odeya xwarinê. Li wir maseyeke girower û mezin hatibû danîn. Nîvê yên li dor maseyê cotkarên zeviyên din bûn û nîvê din berazên herî hêja bûn û hemî bi hev re rûniştîbûn. Naplyon cihê herî baş ji xwe re biribû û seroktiya civakê dikir. Xuyabû ku berazan bi hêsanî cihên xwe li ser rûniştikan çêkiribûn.

Qeremaç dilîystin, lê lîstika xwe rawestandin ji bo ku peyaleke mey vexwin. Mey gelek anîbûn û hema peyala ku vala dibû dîsa dadigirtin. Haya kesî ji

wan ajelên ku li ber pencerê ye mabûn matmayî, nebû.

Pilkington, xwediyê zeviya Foxwood rabû ser xwe, peyala wî di destê wî de bû û xwest gotinekê bibêje. Pilkington got:

-“Ez gelekî dilxweş û dilşadim ji ber ku ev maweya dirêj ji dûrketina tênegihiştina me ji hev re nema û bawerim ku hemî kesên niha li vir amade weke min dilgeş in. Demekê hinekan çavê xwe berdabûn Zeviya Ajelan û mêrgên wê. Hinekan ji mirovan dixwestin Zeviya Ajelan bînin xwar û têxin bin destê xwe, tiştên wilo nexweş me dîtin, çavê wan bar nedibû ku zeviyek tenê ji ajelan re hebe û serokên wê beraz bin. Ji ber wê bandora wê hebû ya li ser zevî û ajelên wan. Gelek cotkaran bawer dikirin ku zeviyeke di bin destê ajelan de be ev yekî dijî siruştiyê ye û pêwist e were dagirkirin. Ji ber ku ditirsiyan li ser ajel û zeviyên xwe, ta ku ditirsiyan ji mirovên karmend jî yên li cem wan kar dikin. Lê

hemû raman niha çûn, îro ez û hevalên xwe me serdana Zeviya Ajelan kir û me her tişt li vê zeviyê bi çavê xwe dît. Lê ma em çi bibînin; ne tenê rêbazên pir dirûst her wiha rêzkarî û rêxistin ku di vê bibin mînak ji hemû cotkarên din re li her dewerê. Ez ji dil dibêjim, ji ber ku bi rastî dibînim ajelê pola duyem bêhtir li vir kar dikin û êmê xwe kêmtir dibin ji êmê ajelên zeviyê din li bajêr. Bêguman me îro tiştên gelekî baş li zeviyê dîtin û em dixwazin di nêz de em jî bibin weke wan."

Dixwest gotina xwe bi dawî bike lê dîsa pê de çû û got ku gelek dilxweş e bi vê lihevhatiya ya ku pêwîst bû çêbibûya di navbera Zeviya Ajelan û zeviyê derdorê wê da. Her wiha cudahî di navbera beraz û mirovan de nîne û divê nebe. Hêvî û daxwaz û xebata wan yek e. Ma pirsgirêk û derdên kar li her cihî ne yek in? Dîyar e ku Pilkington xwest tiştekî girîng bêje, lê bi wî re dernediket, gelek serxweş û mest bû. Mey di ber de ma û bêhna wî

nema derket, rengê hinarokên rûyê wî mor bûn lê dîsa hate ser xwe û karîbû axaftina xwe berdewam bike û got: “Eger ajelên we yên çîna duyem hene ji bo hûn karên xwe bi wan bikin çînên me jî yên nizim hene”, vê peyvê hişt taqtaqeke bilind bi wan bikeve. Careke dî Pilkington pîrozbahîya berazan kir li ser êmê kêm ku didine karkerên xwe û karên rojane ê dirêj dikin û weke wî dît ti bêhnvedan li Zeviya Ajelan ji karkeran re tunebû.

Di dawiyê de daxwaz ji amedekaran kir ku rabin ser pê û peyalên xwe hildin û got: “ezbenî, ez dixwazim em peyalekê ji bo dewlemendiya zeviya ajelan vexwin.” Hemî dilxweş bûn Naplyon pir şa bû ta ku ji cihê xwe rabû çû aliyê din yê maseyê cem Pilkngton ji bo peyala xwe li ya wî bide.

Piştî qerebalix kêm bû Naplyon ma li ser piyên xwe û wî jî xwest ku gotinekê bide. Weke hemû gotinên wî kurt û di

cihê xwe de bû û got: “ez dilxweşim ku ew dema dilmaniyê û nelihevkirinê niha bi dawî hat.” Piştre got, go demeke dirêj hinekan ji dijminan ku ramanên qirêj di serê wan de bûn, axaftin û nîx digerandin li ser Naplyon ku ew hogirên wî wêranker û şoreşger xuya dikirin, lê ev ne rast e. Li ser wan hate gotin û bawerkirin ku dixwazin raperînekê di hemî zeviyan de pêxin.

Lê ev hemî derew bûn, tenê hêviya berazan bû ji mêj ve heta niha jiyaneke bi aşitî bijîn û têkeliyên kar yên siruştî bi zeviyên din re hebin. Li vê zeviyê hevbeşî û hevrîkarî heye. Hemî karên wê yên sereke û bingehîn beraz hemî bi hev re dikin. Ev zeviya ku serbilindahî ye jê re birêvebirina wê, her wiha got ew bawer nake ku hîna ew berguman yên berê hene. Lê vê dawiyê hinek guhertin di rûtîna zeviyê de çêbûye ku dibe bandora wan li ser van bergumanan hebe û peywendiyên navbera berazan û mirovan

baştir bike. Weke mînak ta niha ajelan li zeviyê sinc û çandeyeke cewt bi xwe girtin ku bang hev dikirin “heval”. Ev tişt ji niha û pê ve namîne. Her wiha sinceke din jî heye, yeke pir ne siruşti ye û nexuyaye ku koka wê ji ku derê ye ku li dora hestiyê serê berazekî digerin li baxçeyê. Ev jî nema dimîne. Ji îro pê ve ew hestiyê serê beraz hate binaxkirin û veşartin. Dibe hinekan ji mêvanan ew ala kesk dîtin, û bêguman wan dît ku me ew sim û sitreh ji ser rakirin, wê tenê alek kesk be, tiştek li ser namîne ji îro pê ve.

Yek rexna wî hebû li ser peyva Pilkingtoon ya gelekî baş ku di axaftina xwe de navê Zeviya Ajelan bikardianî. Lê belê Naplyon ragihand ku navê Zeviya Ajelan hatiyê rakirin, û di cihê wê de navê wê bûye Zeviya Manor. Go di baweriya wî de ev nav yê rast û resen bû. Di dawîyê de Naoplyon got: “Geli berazan! Emê dîsa peyalên xwe dagirin û vexun li se dewlemendî û zengînîya

Zeviya Manor." Dîsa qerbalixa şahiyê çêbû û şûşeyên xwe bi ser xwe de kirin.

Ajelên li derve çavên wan çûne nav serê wan û li wan dimeyzandin û tiştekî nebûyî li ber çavên wan dibû. Rûyê berazan dihate guhertin, ne weke yên berê bû. Clower bi wan çavê xwe yên pîr li wan dinhêrî, li ber çavên wê rûyên wan diketin nav hev û dû de û nema ew nasdikirin.

Çepik li hundir bi dawî hatin û vegeriyan lîstika qeremaçên xwe. Ajel hemî hêdî hêdî dûr ketin, lê gelekî dûr neçûn û rawestiyan dengê teqereqeke bilind hat ji wê odeyê, ajel bi lez vegeriyan û di pencerêyê de dîsa meyzandin qerebalixek pir bilind û qeqeşûnek dîtin, qîr û qîj bi dora maseyê ket. Bi çavên gumanîyê û derewan mirovan û berazan li hev dinihêrîn û sedema vê kêşeyê Naplyon-Pilkinkton bû herduyan bi hev re pelika asê maça avêtin di yek lîstikê de. Û hemî yên li

hundir qîr dikirin bi dilman û kîn. Hemî weke hev bûn çi beraz û çi mirov. Niha guman nebû ku ev beraz ne yên berê ne. Wan afirandeyên ku li derve li wan dinhêrîn çavên xwe ji ser berazekî dibirin ser mirovekî û ji ser mirovekî vedigerandin ser berazekî. Lê niha nekarîbûn bizanin kî kî ye.

##########################################

*Bi dawî bû.*

# Zeviya Ajelan
# Nivîskar: George Orwell
# Animal Farm

ji Engilizî wergirt ji bo Kurdî:

**Rewşen Hisên**

##### 27400 ##### .